



Di sala 1988'an de Sedam

Îro jî Tirkîye

napalmê bi kar tîne

Rûpel-3

Hevpeyvîn ligel Güler Çınay:
Kesê bédeng bimîne,
jixwe mirî ye


Rûpel 8-9

Wêje:
Bi kurdî nivîsandin
helwesteke siyasî ye

Rûpel-10

Nûçe-şirove:
Kîşttoxê tever de,
roşnîkarê zere de

Rûpel-15



SAMI TAN

Çeteyên komara 74 salî, çend salî ne?

Di ser avabûna komara tirk re 74 sal, di ser qezeya Susurlukê re salek derbas dibe. Mijar ji rojeva gel derneket. Lê rayedarên dewletê endamên çeteyan ji girtîgehê derxistin.

Hefteya çûyî sâlvegera 74'an a avabûna komara tirk bû. Li gorî nûçe û şîrovevên çapemeniya tirk, ev cejn gelekî bi çofî hatiye pîrozkirin. Lê dema mirov baş bala xwe dida dîmenan, dihat dîtin ku ji bilî çend kemalîstan, kes beşdarî pîrozbahiyên nebûye. Bi taybetî li Kurdistanê hêzên dewletê di nav tirs û saweke mezin de bûn, lewre li gorî saloxên ajanên wan, hêzên ARGK'ê di nava amadehiya çalakiyên xwe fedayî de bûn.

Di pîrozbahiyên de dubendiyekê bala mirov dikişand, li aliyekî dilxwazên Partiya Refahê, li aliyê din kemalîstên CHP'yî. Di pîrozbahiyên de dîmenên sosret bal dikişandin. Bo nimûne li hemberî strana Mahsun Kırmızıgül a bi navê "Kardeşlik Türküsü", xortên faşîst bi tiliyên xwe nişaneyên gurebozan dikirin. Vê yekê meteloka tir û das anî bîra me, gureboz li ku û biratî li ku.

Vê hefteyê di ser avabûna komara

tirk re 74 sal, di ser qezeya Susurlukê re salek derbas dibe. Ev bû salek ku diyar bûye çeteyên dewletê hene, yan jî dewleta çeteyan heye. Tevî hemû hewl û catên rayedarên dewletê mijar ji rojeva gel derneket. Lê dîsa jî rayedarên dewleta tirk tiştê ku ji destê wan dihat, kirin û endamên çeteyan ji girtîgehê derxistin.

Piştî 74 salan êdî tê dîtin ku komara tirk bi vî awayî nikare bimeşe, jê re hinek guherîn divên, asta van guherînan girêdayî rayedarên dewletê ye. Dema îro bi dilê xwe werin rayê û hin guherînen pêwîstîrîn bikin, belkî dirûvê komarê pir neguhere, lê dema ew li ber xwe bidin, guherîn bi darê zorê, bi destê kedkaran çêbe, êdî ji wê komarê tiştêk li holê namîne.

Nakokîya di navbera çeteyan û demokatan di her qadê de diyar dibe. Li hêlekê tevgera azadîxwaz, li hêla din çete; li hêlekê nivîskar, rewşenbîr û li hêla din diz û kujer; li hêlekê Yaşar

Kemal, Eşber Yağmurdereli û li hêla din Veli Küçük, Burhan Özfatura...

Faşîstên ku bi endamên çeteyan serbilind dibin, dema qala efûkirina rewşenbîran tê kirin, dîn û har dibin. Kesên mîna Burhan Özfatura qet nebe ya dilê xwe dibêjin. Lê, kesên ku navê demokratîyê li xwe dikin, durûtîyê dikin. Ev rewşê kambaxtir dike. Bo nimûne Özfatura dijîmîniya xwe ji bo Yaşar Kemal û Eşber Yağmurdereli bi zimanekî kirêt diyar dike, lê nivîskarê Radikalê Avni Özbilgen xwedêgiravî piştevaniya azadiya derbirinê dike, lê dijîmîniya xwe ji dîtin û ramanên Yağmurdereli re diyar dike.

Ev komara 74 salî ber bi dawîya temenê xwe ve diçe. Çeteyan destê xwe kirine qirika wê, ew anîn radeya xeniqînê, lê wê jî destê xwe kiriyê qirika kedkar, rewşenbîr û bindestan. Heke kedkar û azadîxwaz dest nebin xwe wê tevî komara 74 salî bixeniqin.

Demokrasîya rûreş

Ferhengok

ajal: sewal, heywan	pêgihatin: lêrasthatin
ajokar: sofor	pêşangeh: sergi
arastekirin: yoneltmek	pirsiyarî: lêpirsin
asayî: normal	pîrozbahî: kutlama
bilêvkirin: telâfûz	pûrt: perî
biwêj: îdiyom (deyim)	ran: but
bi xwezayî: bi siruştî (doğal)	ramyarî: siyasî
bîlan: lasayî, teqlît	rastgir: sağcı
debar: aboñ (geçim)	reşbîn: bedbîn
destkarî: destdirêjî, mudaxale	rewîşt: sinc, ehleq
deng: rey (oy)	rûberî: hevberî,
derûnî: giyanî, psikolojik	rûrandin: hilweşandin
dirav: pere	salox: agahî, îstîhabarar
dîmen: xuyang	saw: tirs, xof
dûgel: dewlet	sosret: eceb, seyr, balkêş
endazyar: muhendîs	spehî: bedew, rindik
erjeng: tirsnak	stwan: şemsîye
gelempert: giştî	tawanbarî: suçdar
gêş: kêşê, pirsgirêk	teqez: misoger,
gînc: cemawer,	têkildarî: eleqedarî
giyanewer: rihber	têkûz: bêkêmasî
guncan: guncaw,	vevwendî: ezimandî
perzandin: lopandî	xak: ax, erdîma
peyvir: erk, vatînî	xwerû: resen, orjînal
	zanîngeh: unîversîte
	zî: ajalda (filiz)

Î. CAN DILBIRÎN

Mêtingerên ku amadekariya tevkujiyekê li Kurdistanê dikin, rûyê xwe yê gemarî careke din nişanî mirovatiyê didin.

Ji ber van sedeman hêzên taybetî, berê xwe didin kes û mirovên welatparêz. Îro kurdên ku li Kurdistanê dijîn ji sedî 65'ê wan di bin îşkence û tirsê psikolojîk de dijîn, % 25 ê wan bi kuştinên bêdarizandin gef li wan tene xwarin. Ewrûpaya ku dibêje ez alîgirê mafên mirovan im, piştigiriya van kirinên dewleta tirk dike. Vêca li ku derê dimîne demokrasî û mafên mirovan? Di vir de rûreşîya demokrasîya wan derdikeve meydanê.

Gelo ev yekê tê çî wateyê? Dewleta tirk, dixwaze bi vî rengî darbeyeke li têkoşîna şoreşa neteweyî bide û gelê kurd ji xebata şoreşgerî dûr bixe. Bêguman ne tenê dewleta tirk vê yekê dixwaze, hemû welatên hevkar û hevalbendên wê jî piştigiriya wê dikin.

Di serî de dewleta Almanya û di pey re jî Îsraîlê. Ev welat li ser berjewendiyên xwe yê bazirganiya çekên leşkerî ku difiroşin dewleta tirk, naxwazin pîrsa kurd û Kurdistanê bê çareserkerin. Di nava welatên ku piştigiriya herî xurt didin Tirkiyê de Amerîka, rolekî mezin dileyize. Amerîka ji bo ku li Rojhilat Navîn wargehekî xwe yê bingehîn ava bike

serî li hemû rê û metodên xapandinê dide.

Bi vê yekê jî, dixwaze têkoşîna di bin rêberîya PKK'ê de bide rawestandî. Di Rojhilata Navîn de Amerîka, Tirkiyê û Îsraîlê ji xwe re mîna tajiye nêçirê bi kar tîne. Geh wan berdide Iraqê, geh berdide Îranê. Lê di van salên dawî de ew dixwaze li ber têkoşîna kurdan a ji bo serxwebûn û azadiyê hinek keleman deyne. Niha bi taktîkên nû êrişan dibe ser hêzên şoreşger ên Kurdistanê. Lê ev

Di nava welatên piştigiriyê didin Tirkiyeyê de Amerîka rolekî mezin dileyize û ji bo ku li Rojhilata Navîn wargehekî xwe yê bingehîn ava bike serî li hemû rê û metodên xapandinê dide.

yeka han li hesabên hinek welatên din jî nayê, dewleta Îranê jî yek ji van dewletan e. Ji ber ku dema têkoşîna kurdan têk here, wê Amerîka fermana welatên Rojhilata Navîn rake. Îro Kurdistan bûye navenda stratejiya di navbera Rojhilata Navîn û Ewrûpayê de. Dema ku şerê kendavê dest pê kir, ewrûpiyan balafirên xwe yê şer jî balafirgehên Tirkiyê radikirin, ji bo ku hêzên Sedam û Iraqê bombardîman bikin. Di vî navberê de destên xwe dirêjî xaka Kurdistanê dikirin.

Dixwestin serok û axayê eşîran bi

qutiye konserveyan bixapînin da ku maden û nefta Kurdistanê ji xwe re bi kar bînin.

Xeyala wan û Tirkiyeyê bi hev re ew bû. Wan kurd wekî kurdên berê didîtin. Lê ji dema ku PKK'ê li bakurê Kurdistanê dest bi têkoşîna rizgariya neteweyî kir û pê de, ramaneke neteweyî û welatparêzî li her çar beşên Kurdistanê belav kir. Ew sinorên ku dewletên dagirker xistibûn serê kurdan, ji serê wan derxistin, Bakur, Başûr, Rojhilat bi mêjiyekî neteweyî gihandin hevûdin. Piştî ku li Rojhilata Navîn der barê kurdan de, dewleta tirk û hevkarên xwe bi ser neketin, taktîka xwe ye li dijî PKK'ê guhartin. Dîsa di serî de, Almanya, di kewçêrê sala 1993'yan de PKK'ê û rengên gelê kurd û tevgera neteweyî qedexe kirin.

Bombeyên kîmyewî ku Sedam di sala 1988'an de avê-te bajarê Helepeçeyê derket holê ku yê dewleta dewleta Elman in. Almaniyayê jî nedixwest ev yek bikeve rojevê. Ji ber ku bi vî yekê re dê durûtîya wê jî derkeve holê. Niha planên nû diafirînin, li ser başûrê Kurdistanê ew xwe bi xwe li hev nakin, siyonîst dixwazin Kurdistanê li gorî xwe ava bikin. Lewra îro, bi hemû derfetên xwe yê teknîkî piştigiriyê didin dewleta Tirkiyeyê. Lê gotineke bav û bapîran heye; dibêjin: "Se direye, karwan dibûre."

Di sala 1988'an de Sedam

Îro jî Tîrkiye napalmê bi kar tîne

Dewleta tirk ku li hemberî gerîlayên ARGK'ê guh nade rêz û rêçikên şer û mirovahiyê, îcar li Başûr bi çekên qedexekirî êrîşî ser hêzên azadîxwaz dike. Li gorî daxuyaniyê YNK'ê balafirên tirk bi bombeyên napalm û mîsketê çeperên wan bombebaran kirine.

Berî pêşîn girtina Eşber Yağmurdereli, pişt re jî şerê başûrê Kurdistanê û çalakîyên gerîla li Behra Reş dewleta tirk tengazer kirin. Bi awayekî giştî jî li ser çalakîyên gerîla yê li Behra Reş hate rawestîn. Hikûmetê berê pêşîn li Ordüyê civînek pêkanî, pişt re jî li Enqerê civîneke duyemîn pêk hat. Lê di dawiyê de tu encam derneket, ji ber vê yekê jî wê civîneke din di rojên pêş de di bin reveberiya MGK'ê de bê lidarxistin. Civîneke duyemîn jî li Lîceya Amedê ku berê Serokê CHP'ê Deniz Baykal jî nikaribû biketayê, pêk hat. Di wê civînê de Serokwezîr Mesut Yılmaz jî wekî Süleyman Demirel û Erdal İnönü îtîraf kir ku li herêmê "pîrsgirêkeke etnîkî" heye, di çareseriyê pîrsgirêka kurdî de divê ev yek jî li ber çavan bê girtin.

Bi vê yekê re hinek derdorên siyasî di sa dest bi weşandina hinek raporên li ser kêşeya kurd û Kurdistanê kirin. Bo nimûne-heyeta CHP'ê ku berî niha bi çendekî çûbû Kurdistanê raporek amade kir. Li gorî vê raporê bi pereyên ku li şer hatine xerckirin, karibûne "herêmê xera bikin, ji nû ve ava bikin". Kesên ku rapor amade kirin, dixwazin ku kêşe di nava sînorê dewleta unîter de bê çareserkin. Li aliyê nasîna nasnameya kurd tê xwestin, li aliyê din jî tê gotin ku kesên rantiyer, li herêmê fitnekariyê dikin. Di vê raporê de jî li giranî li ser rewşa aborî ye.

Li aliyê din mebûsê serbixwe Bülent Tanıl jî bo pêşveçûna aboriya Kurdistanê bi navê DGAP'ê planek pêşkêşî raya giştî kir. Di vê raporê de jî aliyê siyasî ve tu pêşniyar nîn in, bi tenê di warê aborî û rêveberiyê de hin guherîn hatine pêşniyar kirin. Berê jî li ser heman mijarê çend ra-

por hatibûn amadekirin, yek ji wan jî aliyê TOBB'ê ve bi destê Doğu Ergil hatibû amadekirin. Tevî gelek nîqaş û gelemşê li ser çûbûbûnê jî, tu encam ji wê raporê derneketibû. Dîsa raporek jî ji aliyê Sakıp Şabanci ve hatibû amadekirin. Li gorî hin çavkaniyên Serkaniya Giştî ya Tirkîyê jî raporek amade kiriye û di raporê de derketiye holê ku kurd bi gelemperî PKK dipejirînin. Ev jî Serkaniya Giştî ditirsîne ji ber wê yekê nahêle siyasetmedar nêzîkî çareseriyê kêşeya kurd bin.

Gerîlayan avêtin ser qereqola Elkê

Bi van rûdanan re şerê li Başûrê Kurdistanê, çalakîyên gerîla li Bakurê Kurdistanê û Behra Reş her roj zêdetir dibin. Hefteya çuyî li Elka (Beytuşbab) Şernaxê 7 leşker 4 cerdevan di çalakîyê gerîlayan de hatine kuştin. Berê jî li Culemêrgê, Wanê, li Şebinkarahisara Giresunê, li Lîceyê û Bîngolê gerîlayan çalakî pêk anîbûn.

Dewleta tirk hefteya borî çeperên Hêzên Yekbûyî yê Kurdistanê û YNK'ê bi bombeyên napalm û mîsketê bombebaran kirin. Di encama bombebaranê de li gorî agahîyan 20 sîvil hatine kuştin. Li ser vê yekê di 24'ê mehê de Serokê YNK'ê Celal Talabani daxuyaniyek da çapemeniyê. Li ser van daxuyaniyên YNK'ê Amerîkayê dewleta tirk bi zimanekî tûj rexne kir ku demeke kurt de ji başûrê Kurdistanê derkeve. Dîsa li gorî daxuyaniyên Büroya YNK'ê ya li Derveyî Welat PDK'ê di 19-20-21'ê kewçêrê de 760 û di 24'ê heman mehê de jî 150 malbatên ku alîgirên YNK'ê ne, ji Hewlêrê dûr xistine.



Gundên Suryanî û Asuriyan hate bombekirin

Hêzên Yekgirtî yê Kurdistanê jî daxuyandin ku şerê wan û PDK-dewleta tirk li derdora Hewlêrê çiyayê Şaxesor û Zerdekan bi awayekî dijwar didome. Roja 28'ê kewçêrê balafirên tirk bi qasî saetekê herêma şer bi bombeyên napalm û mîsketê bombebaran kirine. Hate diyarkirin ku Hêzên Yekgirtî yê Kurdistanê di êrîşkê de qereqoleke PDK'ê bi dest xistine 6 pêşmerge PDK'ê hatine kuştin û 3 erebeyên leşkerî hatine rûxandin.

Dewleta tirk gundên Suryanî û Asuriyan jî bombebaran kir. Li gorî daxuyaniya Komeleya Şoresger a Suryanî û Asuriyan Beyt Nehran dewleta tirk li Metînayê 10 li Habur-Haftanînê jî 20 gundên wan bombebaran kirine.

Öcalan: Şerê me bi dewleta tirk re ye

Li ser şerê başûrê Kurdistanê û rewşa siyasî ya dawîn li Tirkîyê û dinyayê di 27'ê mehê de programek bi navê Panel di MED-TV'yê de hate weşandin. Serokê Giştîyê PKK Abdullah Öcalan jî bi telefonê beşdarî ve bernamêyê bû. Öcalan li ser rewşa Başûr daxuyand ku PKK ji berê zêdetir li herêmê xwedî înisiyatîf e. Li gorî daxuyaniya Öcalan ji sisiyan diduyê herêmê di bin kontrola gerîlayan de ye. Dîsa Serokê Giştî yê PKK'ê Öcalan da zanîn ku ew ji gelê Başûr piştgiriyê xurt distînin û şerê ku li wê derê tê meşandin jî ji aliyê ciwanên başûrî ve tê pêkanin. Öcalan axaftina xwe wiha domand: "Em êdî li Başûr jî bi PDK'ê re ser nakin, şerê me bi dewleta tirk re ye. Dewleta tirk çeperên Hêzên Yekgirtî yê Kurdistanê bombebaran dike, ew jî li hemberî dewleta tirk şer dikin. Êdî ji bo çareseriyê kêşeya Başûr jî divê dewleta tirk bi me re rûne."

NAVENDA NÜÇEYAN

Kurtenûçe

Roja 25'ê kewçêrê

Li ser Leyla Zana di rojnameya Washington Post de gotarek hate weşandin. Di gotarê de ji bo Leyla Zana tê gotin ku ew lêveker (cudakar) e, lê ne terorîst e. Her wiha di nivîsê de tê gotin ku ji bo çareseriyê pîrsgirêka kurd, dewlet dikare ji Leyla Zana îstifade bike. Di dûmahîka gotarê de wiha tê gotin: "Leyla Zana mafê tayînkîrîna gelê kurd bi awayekî vekirî tîne zimên. Dibe ku Zana û PKK li ser hîn tiştan di heman fikrê de bin. Lê ev nayê wê maneyê ku Leyla Zana, terorîst e. Li gorî sîstema fermî a tirk lêvekerî û terorîzm yek e."

Li dijî gotin û

Daxuyaniyên rayedarên tirk ku dibêjin "êdî PKK qediyaye", "Me piştta wan şikand". Gerîlayan Artêşa Rizgariya gelê Kurdistanê roj bi roj livbaziyên xwe zêde dikin. Livbaziya dawî roja 27'ê kewçêrê li gundekî Elka Şernaxê qewimî. Li gorî daxuyaniyên fermî di vê lihevixistinê de 7 leşker, 4 jî cerdevan hatine kuştin, 6 leşker jî bi awayekî birîn-xedar rakirine Nexweşxaneyê Dewletê ya Şernaxê. Lê li gorî çavkaniyên herêmî kuştî û birîndarên hêzên leşkerî zêdetir in.

Weqfa Kennedy

Ku Navenda wê li Washingtona Amerîkayê ye, ji Tirkîyê û Kurdistanê Xelata Mafên Mirovan dane du parêzeran. Weqfa Kennedy daxuyand ku, ji Komeleya Mafên Mirovan şaxa Amedê Parêzer Sezgin Tanrikulu û Serokê Komeleya Hiqûqzanên Hemdem (ÇHD) yê berê Parêzer Şanal Saruhan, ji ber ku doz û xebatên mafên mirovan dişopînin, layiqî xelata mafên mirovan hatine dîtin. Di nav dozên ku Şanal Saruhan û Sezgin Tanrikulu dişopînin de îşkence û mirin, înfazên bêdarizandin hene.

Navenda

Çanda Mezopotamya NÇM, piştî şaxên Stenbol, İzmir, Amed, Edene, Mîrsin û Hewlêrê roja 25'ê kewçêrê şaxa Rihayê bi beşdariya 2 hezar kesî vekir. Vekirina NÇM'ê bi deqîqeyekê rawestîna hurmetê ji bo şehîdên şoreşa Kurdistanê dest pêkir. Seroka NÇM'ê Nuray Şen li şer girîngiya rojê axivî. Pişt re jî Koma Agirê Jiyana stranên xwe û Teatra Jiyana Nû bi listika 'Gusto' derketin pêşberî beşdaran. Her wiha dengbêj Mahmut Kızıl çend kilam gotin.



Hînbûn û axaftina zimanê kurdî

Bi rastî pirî caran, di kovar û rojnameyên kurdan de li ser hînbûn û axaftina zimanê kurdî tê rawestîn. Xwendevan û nivîskar dinivîsin; dikin qêrîn, bang û hawar. Dibêjin bi zimanê xwe bixwînin, binivîsin. Qêrîna wan digihêje asîmanan, lê belê nagihêje gelê wan. Gelo çima gel nabihêze, an jî naxwaze bibihêze?

Ka em li pêvajoya ku em tê de dijîn binêrin. Qedexeya li ser zimanê me çi qas asteng e? Ji bo ku em hîn bibin derfetên me hene an na? Tiştê herî girîng; divê em çima zimanê xwe hîn bibin? Emê çi wînda bikin an jî wê çi bikeve destê me?

Di serî de, tiştê ku em ji hînbûna zimanê xwe wînda bikin nîn e. Lê belê tiştên ku em qezenc bikin gelek in. Dema em li zimanê xwe xwedî derkevin, di kolan û kuçeyên metropolan de bi axivin, wê gelê tirk jî bibîne ku kurd hene û zimanê wan jî heye. Lê belê dema em wisa nekin tirk wê me qediyayî û asîmîlebûyî bihesibînin. Heger ku em bixwazin asîmîle nebin, pêwîst e em timî li her derê bi hev re bi kurdî biaxivin.

Gelo ji bo ku em zimanê xwe hîn bibin, pêwîst e em dest bavêjin çekan, bîn kuştin, bîn girtin, li ser çiyayan ji sermayê bişewitin, birçî û tazî bimînin?

Ev tişt jî me nayên xwestin ji bo hînbûna zimên.

Tiştê ku ji me tê xwestin di mala xwe de, bi malbata xwe re, bi hevalên xwe re bi zimanê xwe axaftin e.

Heger piçekî rûmeta kesên di berdoza we de şehîd bûne, yên ku hatine girtin, yên ku seqet mane li ba me hebe emê wan nedin şermê, emê jî li dozê xwedî derkevin. Tiştên ku ji destê me were divê em bikin. Ziman jî parçeyekî vê dozê ye.

Em navên şoreşgeran li keç û kurên xwe dikin: Egît, Zozan, Şervan û hwd.

Ê gelo ew qas ji bo xwedî derketina dozê bes e?

Dixwazim mînakekê bidim. Rojekê ez li sûka Stenbolê bûm. Jinikekê bi meles, kurê wî jî paşda mabû û bangî kurê xwe dikir:

—Niye yavaş gelisen Egît.

Dema ku min ev deng bihîst, ez şaş bûm, mat mam. Ez wiha fikirîm: “Gelo vê jinika hanê dizane Egît kî ye, navê kê ye? Miheqeq zane. Ku nizanibe navê lawê xwe nedikir Egît. Ku piçekî rûmeta Egît (Heval Egît) li ba vê jînekê û malbata wê hebûya wê bi Egîtê xwe re

Bi hînbûna zimanê xwe tiştên ku em qezenc bikin gelek in.

Dema em li zimanê xwe xwedî derkevin,

wê gelê tirk jî bibîne ku kurd hene û zimanê wan jî heye.

Lê belê dema em wisa nekin tirk wê me qediyayî û asîmîlebûyî bihesibînin.



Li ser çiyayekî Kurdistanê darek

bi tirkî nepeyiviya. Ez serê we neêşînim. Lê wê demê serê min pir êşîya. Ez nêzikî wê bûm min got:

—Xwişka min ku tu baş bi tirkî nizanî, qene bi zimanê xwe xeber bide.

Jinik wê demê pariyekî şaş ma. Paşê ez hîn bûm ku cîrana me ye, ji malbateke pir welatparêz e!

Minakên wiha pir in. Carinan ez ji hin kesên bi vî rengî dipirsim: “Hûn çima bi zarokên xwe re bi kurdî naaxivin?” Dibêjin: “Lê dema diçin dibistanê bi tirkî nizanin, di nava hevalên xwe de zehmetiyê dikişînin.”

Rastiya vê bersivê çi qas heye? Ka ez mînakekê bidim hûnê bibînin:

Rojekê ez li saziyeke kurd bûm. Keçikeye 5 salî bi navê Şîlan bala min kişand. Ev keçik hem baş bi kurdî dizane hem jî baş bi tirkî dizane. A niha hinek dibêjin wiha ne hêsan e. Bi rastî hêsan e. Ku malbat zanibe zarokan xwedî bike û perwerde bike, tiştêkî hêsan e.

Dixwazim dîsa vegerim ser Şîlanê. Dema ez pê re diaxivim min digot qey li hemberî min mamosteyek heye. Wê demê ew kesên ku li wê derê ne şerm kirin; serê xwe dane ber xwe. Ji bo ku xwişk û birayên wan baş bi kurdî nizanin.

Mirov dibîne dema ku mirov bixwaze dikare zarokên xwe hîn zimanê zikmakî bike. Mînakên wiha jî hene. Lê belê ne zêde ne.

Mirov li derdora xwe dinêre, ecêb dimîne. Dinêre camêrekî ji leşkeran lêdan xwariye. Lê îşkence hatiye kirin. Bi mehan û salan di girtîgehê de maye. Dibêje: “Ez welatparêz im.” Bi welatparêzî û şoreşgeriyê serê xwe diêşîne. Lê belê bi pîreka xwe re, bi zarokên xwe re bi tirkî xeber dide.

Em dikarin cihên ku ji bo zimanê kurdî ava bûne jî rexne bikin. Ez bawer im ev tişt mafê me ye. Li avahiyên gel de pêwîst e gel bi zimanê xwe biaxive. Lê belê ev yek bi cih nayê. Çarina rîya min bi NCM'ya Stenbolê diket û ez diçûme wir. Gel bi zêdeyî xwedî li vê saziyê derdikeve. Lê mixabin li wê derê jî bi hev re bi tirkî xeber didin. Vê yekê ez gelekî xemgîn kirim. Lê belê tiştê ku ez pê zêde xemgîn bûm; xebatkarên wê derê, hinek endamên (solîstên) komên muzîkan jî bi hev re bi tirkî diaxivîn. Ez bawer im ev rexne wê cihê xwe bibîne.

Li hêla din hinek bernamê jî li wê derê bi tirkî tên pêşkeşkirin. Mînak; xelatdayîna pêşbazîya çîrokan. Ev bernamê dibû ku bi kurdî û tirkî bihata pêşkeşkirin. Çimkî li wê derê kesên ku bi tirkî nizanibûn jî hebûn. Birêz Helîm Yûsiv û ronakbîrekî ji Rojhilât.

Piştî bernamê Helîm Yûsiv wiha got: Wele ji wan tiştêk fêhm nekir.

Zimanê gazîkirin û qewirandina

ajalan



Tê dizanin ku têkiliya di navbera mirov û sewalan de gelekî kevnar e. Bi taybetî jî têkiliya bi sewalên kedî re, her wekî hûn dizanin li nav kurdan hê jî balkêş e. Çimkî em dizanin ku gelekên kurdan sewalan xwedî dikin. Bi taybetî kurdên gundî hê jî buhayekî giran didin sewalan, ji bo ku debara xwe bikin, sewalan xwedî dikin. Dema ew gazî sewalan dikin dengên taybet derdixin (bi dengên taybet gazî sewalan dikin). Ez dixwazim çend mînakên binivîstinim. Ka mirovên Rihayê û dorhêlên Rihayê çawa gazî sewalan dikin, hêviya min ev e ku ji bo xwendevanan bibe mînak da ku ev çanda me yî taybet winda nebe.

Ho ho: Ji bo gazîkirina ga û sewalên mezin tê bikaranîn û hem jî bo gazîkirin û ji bo qewirandina wan tê bikaranîn. Ev deng bi giştî du caran tê derxistin.

Weh weh: Dema yek gazî mange (çêlek) û golikan dike an jî dixwaze wan biqewirîne, ev peyv tê bikaranîn.

Tehê tehê: Di vir de tîpa 'h' hê'ya erebî ye. Ev peyv jî ji bo gazîkirina mangeyan (çêlek) tê bikaranîn.

Hîr hîr: Ji bo qewirandina mih û beranan tê bikaranîn.

Hîs hîs: Ev peyv dema mirov gazî mih û beranan dike, tê bikaranîn. Tenê tîpa /s/ bi fikandin tê bilêvkirin.

Ey ey an jî êy êy: Ji bo qewirandina bizin an jî nêriyan tê bikaranîn. Tîpa "Ê, E" mîna eyna erebî hişk tê bilêvkirin.

Kîç kîç: Ji bo gazîkirina bizin û nêriyan tê bikaranîn.

Kîd kîd: Ji bo qewirandina karikan tê bikaranîn.

kîdî kîdî: Ji bo gazîkirina karan tê bikaranîn. Ev peyv çend caran li ser hev tê gotin.

Ço ço: Ji bo ajotina keran (cehş) tê bilêvkirin.

Hûş an hîş: Ev deng ji bo sekinandina keran tê bikaranîn.

Çû çû: Ji bo gazîkirina çivikan tê bilêvkirin.

Kîş kîş: Ji bo gazîkirina mirîşkan tê bikaranîn.

Ci ci: Ji bo gazîkirina çivikan tê bilêvkirin.

Hoşt an jî oşt: Ji bo qewirandina kûçikan tê bikaranîn.

Dû dû: Ji bo qewirandina kûçikan ev peyv jî tê bikaranîn.

Ji bilî van gelek dengên taybet hene, lê nayin nivîsandin. Ancax mirov dikare bi deng bide famkirin. Mînak jî bo qewirandina bizinan "ix" "x" bi awayekî dirêj tê derxistin.

REMZÎ QOLXANLI

Divê birînên zimên der bibin

Tête zanin ku ziman ney-nik û delîla jiyana civakî ye; pêkhatina civakan û guherînên çandî di zimên de jî kifş dibin. Dîsa di ziman de kifş dibe ku kurd kî ne, bi kîjan gelan re têkiliyên wan çêbûne; li kîjan gelî hîkarî tesîr kirine an jî kîjan gelan li kurdan hikarî kiriyê...

Ji ber van kêmbûna xebatên akademîk hin mirov kurdan dibin bi sumeran ve girê didin, hin jî dibin bi tirkî ve girê didin. Bo nimûne li gorî nivîseke rojnameya Demokrasiyê (28 avrêl 1996) Gürdal Aksoy gotiye ez di çavkaniyên kurdan de pêrgî peyva "kawa" nehatime! Li gorî Gürdal Aksoy mitolojiya kurdan nîn e, Kawa jî qalê Persan Kuraş ê mezin e.

Vî camêrî bi tenê li ferhengê ku ji aliyê D. İzolî ve hatiye amadekirin binivîsî, wê ev peyv bidîtana: Kaw, kawa, kawani, kawis, kawda, kawêj... dîsa kew, kewê, law, saw, dew, dêw xew... çend peyvên bi kurdî ne.

Hin mirov jî çend peyvên ku ji zimanên biyanan derbasî kurdî bûne hildidin û li dawiyê

sed derewan rêz dikin, hindik ku maye kurdan bibin bi Eskî-moyan ve girê bidin.


Di vê demê de barekî giran li ser milê çapemeniya kurdan û nivîskarên kurd e. Bi taybetî jî li ser milên weşanên mîna Azadiya Welat û nivîskarên wê ye. Lê mixabin ji me pir kes hê jî bi tirkî diponijîn û peyv bi peyv werdigerînin kurdî. Berhemên ku havênê xwe ji çanda gelêrî nestînin, bi ser nakevin. Asım Bezirci dide zanîn ku "Sedar Senghar" wiha gotiye: "Hunermendekî ku bixwaze di nava dîgelên (dewlet) biyan de'bi nav û deng bibe, bê-te hezkirin, ji bo wî rîya herî kin ev e ku berhemên xwe bi ava axa welatê xwe têr û xwedî bike." Her wiha Homeros, Dante, Goethe, Çexov, Tolstoy, Stendhal jî ev nêrîn peji-randine.

Belê divê êdî birînên ji hêla ziman ve jî bête der bibin. Piştî ku birîn der bûn, derman lazim dibe, derman jî xebateke ji dil, fedekariyek mezin e, hezkirin e...

CİHAN ROJ

Kurd tawanbariya Silhedîn dikişînin

XURŞÎD MÎRZENGÎ



Dostekî min î ereb heye, şêxekî mezin e. Navê wî Remezan Feyat e. Lê jê re dibêjin: "Ebû Munsûr" Ebû Mensûr şêst û yek salî ye. Ji Siûdî Erebistanê ye û heta hûn bibêjin dewlemend e.

Min û Ebû Mensûr çar sal berê li Parîsê, li Şanzelîzê, di qehwexaneyê Madrîgal de hev nasî. Ebû Mensûr yekî çavfîreh û merd e. Ga û golik li ba wî yek in. Li Amerîkayê zanîngeh xwendiyê û li Îngilîstanê jî doktoriya xwe ya endazyariyê daye. Lê niha endazyariyê nake. Sih çil maxazayên wî yên cilfirotinê hene. Ji bilî van maxazayan, hîsederê nefta siûdî ye jî. Polîtîkayê baş dizane. Lê tu serê wî jê bikî li pêşberî ereban ji polîtîkayê naaxive. Ji wêje û wêjevaniyê hez dike û hew bi erebî û îngilîzî romanên wî di çentê wî de ne û di riyan û otêlên de dixwîne. Xwendevanekî baş e.

Ebû Mensûr kurdan ji min û we baştir nas dike û ji kurdan hez jî dike, dibêje: "Kurd azbeteke cengawer û mîrxas e..."

Çaxê Ebû Mensûr were Parîsê, bêyî dîtina min, tu serê wî jêkî dîsa naçe. Divê ku min bibîne.

Ev dostê min ê delal wê rojê dîsa hatibû Parîsê û me li Tîreqadero hev ditîbû. Me qehweyên xwe vexwarin û min bi ken ji Ebû Mensûr pirsî: "Şêxê min a niha ev gelşê me kurdan hatiye heya ku derê, êdî wexta destavêtinê nehatiye? Me xwe nasiyê nenasiyê, li ser serê me tefî û dûman e. Mirovên me agir berdidin xwe û xwe dişewitînin. Qîzên me bombeyan dixin paşê xwe û diteqînin. Gund neman, bajar hilweşîyan. Yanê welat wêrane bû, ma ne bes e?"

Şêxê min ê Siûdî bi dilovanî li min nêrî û got: "Hûn tawanbariya xwe nakîşînin, hûn kurd tawanbariya Silhedîn dikişînin. Silhedîn jî xwe re, ji we kurdan re nexebitî. Ji me ereban re xebitî û xaçperest ji Erebistanê, ji cih û warên efrînî û qudsî avêtin derve. Lê kî-n û rîka xaçperestan li ser kurdan civandin ser hev. Ewrûpî jî, amerîkî jî û hemû împeryalên cîhanê jî dizanin ku hûn neviyên Silhedîn in. Ji ber vê zanebûnê xaçperestan hûn kurd tawanbar kirine û hê tawana we neqediyaye."

Min got: "Ne şêxê min rast e, Silhedîn kurd e. Lê wî ji me kurdan re tiştek nekiriye, ji we ereban re şer kiriyê û hûn bûne xwediyê dewletan. Pêwîst e, ji dêla Silhedîn ve hûn ereb bî tawanbarkirin. Hûn

mîrateya wî dixwin. Çima em tawana Silhedîn bikişînin? Ev neheqî ye ku em kurd ji dêlva kirînen Silhedîn ve tînan tawanbarkirin."

Şêx piçekî gunehê xwe bi min anî, bangî keçîka saqî kir, ji nû-ve du heb qapoçîno xwestin û ji min re got: "Dostê min ê romantîk, ez hestên te seh dikim. Tu mafdar î. Lê tiştek heye. Tu dizanî. Lê tu naxwazî ku zanibî. An bibêjî. Kurd nîjadeke jîr û şervan e. Ji xeynî wan kesek bi wan nikane. Polîtîkvanên cîhanê giş ve dizanin. Loma jî ew kirine kerî û parî û ew bera hev dane û didin. Hûn bibin dewlet, hûnê dinê serûbîno bikin. Xelk ji we ditîrse. Em ereb bi xwe jî ji we û dewleta ku hûn çêkin gelekî ditîrsin. Hûn gelekî wisa ne ku hûn nayên rayê. Bi pêvçûn û lêdanê kesek nikane bi we re here serî. Li cîhanê kesek dewleta we naxwaze. Û heya ji wan bê jî, kes nahêle ku hûn bibin xwediyê gotîne. Vê zanibe. Îcar tu digirî jî tu dizanî û tu govendê jî dikî tu dizanî."

Tofanek, lehiyek di cîhana dilê min de rabû ku tofan û lehiya Hezretî Nûh li ber wê ne tiştek bû. Ne keştiyek, hezar û heşt keştî di wê tofan û lehiya dilê min de xeriqîn û min fîncana qapoçîno di du qurtan de qedand. Min jî xwe re got: "Hêla ji bo Xwedê û pêxember, werin li vê sosret û seysebatê binêrin! Silho bila here ji bo ereban şer bike û xelkên neyarên Silho jî bila heyfê ji me bistînin. Ma rewê ye lo?"

Bi dû rêheval Cuma Karaçalı re:

Sexsiyeta şoreşgerêkî, bi alikariya wî ya têkoşînê, bi nixên ku afirandine û dema di vê riyê de fedakariya herî mezin dike û canê xwe feda dike, hê zelal tê dîtin û dibe xwediyê wateyê mezin. Bi gelek bîranîn û rûmetên ku li paş xwe dihêlin, di dilê gel de cihekî mezin digirin û tu carî nayên jibîrkirin. Taybetiyên hemû şehîdên şoreşê yê wî wisa û watedar hene. Yek ji van jî, şehîdê sermawezê rêheval Cuma Karaçalı ye.

Hevalê Cuma, di sala 1963'an de, li Sêwregê hat dinê. Malbata wî pir feqîr bû. Hê di zarokatiya xwe de, wekî her însanekî kurd, Heval Cuma jî, bi sedema nûxandinên ku mêtîngeran di Kurdistanê de çêkirine, yanî şerê navbera eşîrtiyê para xwe stand. Ji ber nûxandinên di nav neteweyê me de çêbûye ji Sêwregê ber bi metropolan koçber dibin. Malbata wî li Tarsûsê bi cih û war dibe û jiyana xwe li wir didomîne. Zarokatiya heval Cuma li wir derbas dibe û li wir mezin dibe. Lê tu carî pêwendiyên wî ji Kurdistanê qut nabin. Wekî her malbata kurd ku koçber dibin, malbata hevalê Cuma jî têkiliyên xwe bi nas û mirovên xwe re qut nakin û tim diçin û dihatin Sêwregê. Cuma, hesreta welat û gel tim dikşîne, ji mercên jiyana metropolê pir aciz dibe, roj bi roj hesreta welat di dilê wî de mezin dibe. Ev hesreta welat û hezkirina wî ya ji bo gel, wî li hemberî geşbûneyên ku li Kurdistanê pêk tên, diltenik dike. Her ku meseleyê ji hev dike, hê bêhtir nêzikî Kurdistanê dibû. Vê rastiya hanê dihişt ku ew bi xwe re û bi jiyana metropolê re bikeve şer. Gava ku didît jiyana metropolê çawa însanan ji rê derdixe û pûç dike, jê sar dibû û nefret dikir. Lê mixabin tu hêzeke ku karibe wî ji vê jiyana xerab xelas bike û bigihîne jiyaneke bi rûmet, ji xwesteka dilê wî re bibe bersiv, nedidît. Ev jî gelekî pê zor dihat. Lewre hêzên ku heya wê rojê hebûn, ji hêviyên wî re nedibûn bersiv û tu tesîr lê nedikirin. Di dilê heval Cuma de Kurdistanek serbixwe, demokrat û yekbûyî hebû. Xeyalên wî li ser vê armancê bûn. Dilê wî wekî robarekî geş, bi evîna welat tijî dibû û difûriya.

Destpêka têkoşîna Sêwregê, ji hesret û hêviyên dilê xwe re wekî bersivêkê dît, dilxweşiyek mezin jê girt. Ev dilgeşiya heval Cuma di dilê wî hilnedihat, dilê wî ji metropolan ber bi welatê ve kişand. Piştî çend êrişên şoreşgerî ku mejiyên bûbûn kole hejandin, ew jî bi rastiya xwe hesiya û bi gavên mezin ber bi şoreşê ve baz da. Bi vê jî derbeyek mezin li dîrketina ji Kurdistanê û kesîtiya ber bi biyanîbûnê xist.

Heval Cuma, ne dîrî terora çeteya Bucakan bû. Baş zanibû ku bi sed salan e ew hevalbendiya dijmin dikin. Ma

sedema koçberbûna gelek malbatên ji welat derketine ne ew bûn? Êdî dem hatibû, niha dema tohildanê bû. Êdî tu hêzan nikaribû wî li Tarsûsê bigirin. Divê laşê wî jî, wekî dilê wî bigihîştê têkoşînê û heval Cuma berê xwe dabû Sêwregê.

Di bihara sala 1980'î de hatibû Sêwregê. Hê me nû hev din naskiribû, di axaftina me ya ewil de hesreta wî ya ji têkoşînê re dihat xuyakirin. Cehda wî ya ji bo tekoşînê, çalakbûn û ji dilbûna wî, bû sedam ku ew bi hevalan re têkiliyên germ deyne. Hesreta dilê wî bi cih bûbû. Ji jiyana koletiyê gavek xurt avêtibû nava jiyana azad. Wî milîtanîya têkoşîneke dijwar û ji agir dabû ber xwe.


Bi

zêdebûna êrişên dijmin re didît ku gelek heval şehîd dikevin. Dît ku di encama van êrişan de gelek heval ketin destê dijmin. Lê bi baweriya xwe ya bi têkoşînê û biryardariya wî kir gavekê din bi pêş de here. Li pêşberî van bûy-

dikirin; ji bo geşbûna têkoşînê û parastina nixan cahdeke mezin dida.

Berî cuntayê û piştî wê gelek endam û şervanên partiyê hatibûn girtin. Li Sêwregê çend heval tenê mabûn. Di demeke wisa dijwar de, ji bo ku yek li ser piyan bimîne, diviyabû xwedî

îradeyek mezin bûya. Di mercên wisa de, ji çend hevalên ku di bin ferdandariya rêhaval Şahîn Kilavuz de çalakî pêk dianîn, yek jî heval Cuma bû. Têvî ku demeke kurt di nava têkoşînê derbas kiribû jî, baş têgihîştibû ku divê yekî Apocî li hemberî dijmin bisekine, di mercên



wisa dijwar de mirov divê karibe li ser piyan bimîne û bêdudilî bimeşe û vê yekê di pratîka xwe de nîşan bide. Vê yekê asta girêdana wî ya bi partî, gel re û hesreta wî ya ji bo welat baş dida xuyakirin.

Piştî pêvajoya pirsîyariyê, ew birin Girtîgeha Amedê. Pêşî ew dabûn xewxaneyên rexistinên burjuwayên biçûk û reformîstên kurd. Li cihê ku dabûnê tu PKK'yî tune bûn, lê ev ji bo heval Cuma nedibû sedem ku ew wekî Apociyekî neji.

eran, hê bêhtir hêz û kerba wî zêde dibû. Bi berpirsiyê mezin û bi biryardariyêke kûr ya ku hesab ji dijmin bipirse xwe bi pêş dixist.

Heval Cuma, her roj bi pêşketina bîrdoza neteweyî tenê nedihat naskirin. Bi safî û dilpakîya xwe jî dihat naskirin. Jiyana metropolê ya hov ew jî paqîjiya wî dîr nexistibû. Lewre dijwariyên ku di demeke kurt de bi wan re rû bi bû, ne dijwariyên biçûk bûn. Di mercên terora 12'yê rezberê de her çiqas gelek kesan ji nav refên têkoşînê baz didan jî, wî hê bêhtir bi têkoşînê re pêwendiyên xwe xurt

Wî xwe li hemberî dijmin bi hêzeke bîngehîn dixemiland. Xwe li gorî têkoşîneke demdirêj amade dikir, lê li dûv bêsiûdiyekê ket destê dijmin. Ev bû destpêka dilîtiya wî ya 11 salan ku di zindanên dijmin de derbas kir.

Di dema 12'yê rezberê de ku hoviyan dijmin roj bi roj zêde dibûn, ketibû destê dijmin û di vê demê de îradeya însanan zû êskere dibû. Heval Cuma jî ji pêvajoya pirsîyariyê bi serbilindî derket û bû xwediyê soza xwe ya ku dabû gel.

Piştî pêvajoya pirsîyariyê, ew birin Girtîgeha Amedê. Pêşî ew dabûn

xewxaneyên (qawîş) rexistinên birjuwayên biçûk û reformîstên kurd. Li cihê ku dabûnê tu PKK'yî tune bûn, lê ev ji bo heval Cuma nedibû sedem ku ew wekî Apociyekî neji. Wî baş dizanibû ku yekî Apocî tenê bi serê xwe jî bimîne, divê li gorî rêz û rêçikên partiyê bijî. Li hemberî zilma ku roj bi roj zêde dibû, gavek paş de neavêt. Xwe li hemberî îxanetê parast.

Li Zindana Amedê dihat xwestin ku, di şexsiyeta dilên PKK'ê de şoreşa Kurdistanê bixeniqînin. Heval Cuma, li rîya ku Mazlum, Xeyrî û Kemal bi berxwedana xwe derxistibûn holê, bi dil û can xwedî derket.

Dijmin her roj êriş dibir ser girtiyan jî, nikaribû heval Cuma tîk bibe û bi biryardarî di çalakiyên rezbera 1983'yan û fîrmeha 1984'an di cih girt. Em hemû di van çalakiyan dibûn şahidê berxwedana wî.

Ew her dem bi hesreta gihîştina partiyê û gel dijiya. Bedenên kelaha jî li pêşberî vê armanca wî nikaribûn bibûna asteng. Bi vê baweriyê di sala 1987'an de gihîşt armanca xwe. Bi hemû hêza ciwaniya xwe, rêça pêkanîna daxwazên dilê xwe bi destê xwe vekir. Ji bo pêkanîna destanên nû hilma derve hîs kiribû. Bi rêhevalên xwe re dibin heft kat deriyê hesin û telên dirêhî de di rîya bin erdê re azad dibûn.... Li Gebar, li Botan dijiyan.

Vê rîya ku xwe di bin erdê dirêjî azadiyê dikir, bi gelek zahmet û fedakariyê hatibû çêkirin. Ew plana azadbûnê bi êrişêke dijmin bi ser neket. Bi şikestina vê hêviyê, mîna hevalên din heval Cuma jî gelekî hejiya; hêvî û keda wan bi avê de çûbû. Di pey re ew û gelek hevalê wî yê din birin Girtîgeha Eskîşehîrê.

Di sirgûniya xwîndar a Eskîşehîr û Aydnê de ew jî yek ji berxwedêrên rêwitiya ku H.Hüseyîn Eroğlu û M. Yalçinkaya tê de şehîd ketin, bû. Vê tevgera wî ya bi biryar, heya sala 1991'ê ku ew derket derve dewam kir. Bi biryardarî û viyana xwe cezayê xwe kuta kir, êdî ew gihîştibû daxwaza xwe.

Navend û wezîfeyên ku wî hesreta wan dikişand li hemberî wî bûn. Hê hesabekî wî yî nivco hebû û diviyabû bihata dîtin. Siwêreg di nava welat de bêdeng û bêhîs mabû, êdî ku dema ruh û nav pê bikeve hatibû. Bi sonda standîna tola hezar salî, ji sahaya serokatiyê, piştî 11 salan berê xwe da Sêwregê. Hê xebata fetihkirin û girêdana bi Botanê ve dikir, dîsa listikên îxanetê yê kiret derfet nedanê ku armanca xwe bi cih bîne.


Di demeke ku wê karibe gelek karan bike û bi xizmetên xwe şoreşa welatê me geş bike, ji nav me koç kir û ket nav refê şehîdên şoreşa welatê me. Lê xwîna wî li ser axa welatê pîroz rijandiyê, wê bibê tova berxwedanê û wê li şûna yekê bi hezaran kulîlk şîm bibin... Navê wî soz û peymana me ye.

□ 4 sermawez 1946:

UNESCO ava bû.

UNESCO, angu Rêxistina Çand, Perwerdehî û Zanistê ya Neteweyên Yekbûyî berî pêncî salî vê rojê hatiye avakirin. Navenda vê sazîyê li Parîsê ye. Ji 150 dewletî zêdetir endamê wê hene. Ji kîjan cins û milletî dibin bila bin, perwerdehî mirovan û pêşvebirina çanda gelan berpirsiya vê sazîyê ye. Bi tenê dewlet ji UNESCO'yê îstîfade dikin. Gelên bêdewlet ji van xebatan bêpar dimînin. Ji sala 1984'an û vir de Amerîka, Îngîlistan û Sîngapûr ji UNESCO'yê derketine.

BÛYERINE JI DÎROKÊ



□ 7 sermawez 1918:

Kovara Jîn dest bi weşanê kir.

Kovara Jîn di payiza sala 1918'an de li Stenbolê dest bi weşanê kirîye. Ev kovar wekî organa ne resmî ya Komelaya Pêşketina Kurdistanê tê binavkirin. Di nava salekê de 25 hejmarên kovarê hatine weşandin. Hejmara wê ya paşîn, angu hejmara 25'an di 2'yê kewçêra 1919'an de weşiyaye. Kovar piştî vê tarîxê hatiye girtin. Serkar û berpirsiyarê vê kovarê jî serî heta hejmara 20'an Hemzeyê Muskî bûye. Piştî re Memdûh Selîm Beg dibe berpirsê kovarê.

Li Ûmraniyeyê lokala HADEP'ê vebû

Lokala yekemîn a Hadepe li Taxa 1 Mayisê vebû. Serokê HADEP'a Stenbolê Hikmet Fidan da zanîn ku ewê li bajarên din jî lokalên bi vî rengî vekin.



Partiya Demokrasiya Gel li taxa 1Mayisê (Mustafa Kemal) lokalek vekir. Di lokala ku roja 26'ê kewçêrê bi beşdariya hezar kesî vebû de, kesên mîna Cigirê Serokê HADEP'ê Bahattin Günel, Parlamenterê Bijarte û Endamê Meclisa Partiyê Sedat Yurttaş, Serokê HADEP'a Stenbolê Hikmet Fidan, ji DEHAP'ê Cigirê Serokê Giştî Nihat Buldan, Mehmet Arıç û H. Ali Alkan, Rêveberê Navendî ya Komeloya Pir Sultan Abdalê Cafer Doğan, Endamê Rêvebirina İHD'yê Veli Haydar Güleç, nûnerên rojnameyên Azadiya Welat û Ûlkede Gündemê û muxtarê taxa 1Mayisê Mazlum Arı jî beşdar bûn.

Beriya axaftinan ji bo tevahiya şehîdên şoreşa Tirkîye û Kurdistanê beşdar deqîqeyekê ji bo rêzgirtina hurmetê rabûn ser piyan.

Axaftina yekemîn ji hêla serokê lokala 1Mayisê İbrahim Özdemir ve hate kirin. Özdemir di axaftina xwe de girîngiya taxa 1 Mayisê ku di sala 1977'an de 12 û di "Bûyerên Gazi" yê de jî 5 şehîd dane anî zimên. Piştî re ji bo axaftinê Serokê HADEP'a Ûmraniyeyê Ekrem Kahraman derket pêşberî gel. Kahraman di axaftina xwe de got ku gelê 1 Mayisê dikare Ûmraniyeyê, Ûmraniye jî dikare Stenbolê rake ser piyan. Lê wî got ku eger samimiyet hebe û wiha berdewam kir: "Îdeolojiya Musolîmî çî be, îro kesên ku hîmê dewleta tirk danîbin jî wisa ye. Ev îdeolojî neteweperest e, şoven e û faşîzan e."

Piştî re bi rêzê Hikmet Fidan, Sedat Yurttaş û Bahattin Günel axivîn. Serokê HADEP'a Stenbolê Hikmet Fidan di axaftina xwe de got ku divê ew ji bo çareseriya pirs-girêkên gel herin ber piyên gel. Lewre jî wan lokaleke bi vî rengî vekirîye. Hikmet Fidan da zanîn ku li Tirkîye û Kurdistanê hewceda-

rî bi demokrasiyê heye. Serokê HADEPê got ku li vî welatî jî bilî çeteyan û kujeran herkes dildarê demokrasiyê ye.

Piştî axaftina Hikmet Fidan, navê Sedat Yurttaş bi banga: "Parlamentêrê bijarte, hevalê Leyla Zana, Hatip Dicle û Orhan Doğan" hate vexwendin. Sedat Yurttaş di axaftina xwe de, bal kişand ser girtina HEP û DEP'ê û wiha got: "Ew kesên ku ev partî girtin, ew kesên ku Leyla, Hatip û Orhan girtin, bila bizanibin ku hejmara me roj bi roj zêde dibe."

Sedat Yurttaş di dawîya axaftina xwe de got ku sistema tirk bi tenê dikare çeteyan bifirîne.

Di çalakîyê de axaftina dawî ji hêla Cigirê Serokê Giştî yê HADEP'ê Bahattin Günel ve hate kirin. Günel di axaftina xwe de rexneyên tûj arasteyî Bülent Ecevit kirin û wiha got: "Îro şirikêkî hikûmetê yê din heye, ew jî li gorî gotina Yaşar Kemal "Bozkurtê Biçûk" Ecevit e. Eger hûn îro "Bozkurtê biçûk" xwedî bikin dema mezin bibe wê we bixwe"

Piştî axaftinan ji KAYY-DER'ê koma mûzikê Koma Rozerîn û ji NÇM'ê Koma Azad bi stranên xwe yê folklorîk û şoreşgerî gel çoşandin.

Piştî sahiyê rêveber û rayedarên HADEP'ê çûn serxweşiya malbata Ali Er Takakê ku hefteya borî ji hêla çeteyan ve li Ûmraniyeyê ve hatibû qetilkirin. Serokê HADEP'a Stenbolê Hikmet Fidan der barê lokala 1Mayisê de bi bîr xist ku ew li Tirkîye û Kurdistanê ev yekane lokal e. Fidan da zanîn ku ji îro û şun de li bajarên wekî İzmîr, Enqere, Amed, Mersin, Edene û Wanê wê lokalên bi vî rengî vebikin.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

ÇAVDÊRÎ

Sedemên têkçûna
dewletê çî ne?



AMED TÎGRÎS

Bîst-sîh sal berî niha filozofê Yewnanî Platon sedemên têkçûna dewletê di çend xalan de tîne zimên. Piştî ew qas sal-dîrok careke din heq dide Platon û rastî û duristiya dîtinên wî di pratîka salan de dipejirîne. Mezîniya kesên filozof jî, ji ber vê yekê ye. Platon ji wan xalên têkçûna dewletê yek wiha fomûle kirîye:

"Dewleta ku bi hesin an jî bi misîzer (tûnc) bê parastin, ew têk diçe."

Yanî Platon dibêje ku ew dewleta ku zordestî û çavsoyîyê bike, bi misogerî (muhaqeq) tê hilweşandin. Dîroka mirovahî û dewletan di vî warî de, ne carekê, ji dema Platon heta îro bi deh hezar carî heq daye vê gotina Platon. Hema wiha bi çavêkî gelemperî mirov li çend dewlet û împaratoriyan mezin û bi nav û deng binêre, mirov dibîne ku çî bi serê wan de hatiye. Dewletên wekî Asûrî, medî, roma, dewletên Îskender, Aleksander, Tîmorê Leng, Osmanî û Sovyeta Berê... çî bi serê wan împaratorên mezin û bi nav û deng hat, dawîya wan çî bû?

Belê bi lêdan, kuştin û dagirkeriyê tu kes nikare heta dawiyê bi ser bikeve. Heger bi ser bikeve jî di dawiyê de, tê şikandin û belav dibe. Temenê serkeftin û serfiraziya zordestiyê gelek kêmtir û kurt e. Lê, li dijberî vê zordestiyê, temenê wekhevî, azadî û biratiyê gelek dirêj e.

Li ser têkçûn û belavbûna dewletê, Platon di xala duyemîn de jî wiha dibêje:

"Leşkerî û pasevanên dewletê heger wekî kesên din dest pê bikin û bibin xwedî-mal, zevî, pere; wê demê ew ji pasevanî û parêzvanîya dewletê dûr dikevin, dibin karsaz û cotkar. Êdî ew nabin parêzvanên niştîmanê, dibin zorbe û dijminê wê. Di vê rewşê de, ew ji kesî hez nakin û kes jî ji wan hez nake. Ew kemînan vedigirin û bi xwe dikevin kemînan. Jiyana wan wiha dom dike. Kesên wiha jî dijminên derbêhtir, ji yê hundir ditirsin. Wê demê jî ew û welatên xwe li ber têkçûn û wêranbûnê ne." Îro mirov dema li rewşa dewleta tirk dinêre, dibêje qey Platon 23-30 sal piştî mirina xwe jî bo dewleta tirk ev mercên han nivîsîne. Wî zanibûye ku de çend hezar sal paşê tirkên Moxol ji Asyaya Navîn ber bi rojava ve koçber bibin û bîr ji nivî bêhtirê welatê wî dagir bikin û piştî 500 salî de rewşa wê xerab bibe û di dawiyê de jî hilweşe. Mirov dibêje qey Platon ne filozof e, pêxember e. Ew çawan dikare ew qas dûr û kûr bibîne?

Îro dema mirov ji her aliyê ve, li rewşa dewleta tirk dinêre, ew mercên ku Platon wê demê jî bo têkçûn û belavbûna dewletê danîne, tam li bejn û bala wê tî. Heta derbas kiriyê û diviyabû jî zû ve ew xerab û belav bûbûya. Îro dewleta tirk ne bi hesin û misîzer, bi helikopterên super cobra, skorskî û fantoman jiyana xwe didomîne. Ji aliyê din ve wekî ku Platon di xala duyemîn de jî, dide diyarkirin, leşker û pasevanên dewleta tirk ne bi tenê ji bo erd xanî û mal û milkên biçûk dixebitin, wan di nav dewletê de komikên çeteyan ava kirine. Sermayeya Tirkîyê ketiye destê wan çeteyan. Ji bo pariyekî xerab goştên hevûdu dixwin. Ew dixwazin bi vî rengî çeteyîyê temenê dewletê piçekî be jî dirêj bikin. Lê ew ne gengaz e.

Niha dewleta tirk ketiye wê rewşê ku berpirsiyarên herî jor derdikevin di TV û rojnameyan de dibêjin: "Dewlet nemaye û wiha nameşe." Ji bo dirêjkirina temenê wê her roj li rê û formûlên rizgarî çareseriyê digerin. Lê her ku diçe dewlet di terkên bivelêzê (erdhejê) de diçe xwarê.

Hunermend Güler Çınay

Kesê bêdeng bim



Li ser vî wêneyî ji min re gotin "ew PKK'yî ye." Jixwe dîtî û ramanên min vî rengî tu dixwazî çî bikî, ez berpirsiya vî wêneyî hîlnadim ser xwe." Piştî rengî li zanîngêhê çênêkî. Dema ku te zanîngêhê qedand çêbike. Qaşo leşkerekî ye. Rojekê hat ji min re got divê hunerme

rengê kêsî olê nişan dide. Tiştêkî min î bi vî rengî nîn e. Lewre jî ez her tiştî direkt nişan didim. Ez çî bibînim wê wekî ku min dîtiye çêdikim.

Di tabloyên we de rengê sor pir kêr e. Gelo sedemeke vê yekê heye?

● Na sedemeke wê nîn e. Ez ji xwî-nê hez nakim, lê ez ji rengê sor hez dikim. Belkî di hin însanan de rewşeke psîkolojîk derxe pêş. Wekî boxe çawa ji sor hez nakin, hin însan jî ji wî rengî hez nakin. Lewre jî sor rengêkî pir xweş e û ez jê hez dikim. Her wiha ev nayê wê maneyê jî ku ezê bixime hemû tabloyên xwe.

Gelek resam dema ku nû dest bi wêne çêkirinê dikin, berî pêşîn wêneyên jina çêdikin, xebatên we yên wisa hene?

● Ji bo min qet fêrî nake. Ez wêneyên zarokan, jinan, mêran û yên her kesî çêdikim. Figûr jixwe wêneyên însanan e. Cudatiya jin û mêran ji bo min nîn e.

Heke hûn qala wêneyên tazî (nû) dikin...

Na wêneyên normal

Belê pir kes di figûran de bi kar tînin. Qest ji de, ax, welat an jî semboleke taybet e ji bo wan tercîhek e. Ji bo min wisa nîn e, ez wê hestê di giyanewerekî din de jî dibînim. Di pisîkekê de, di kûçîkekî de an jî di tiştêkî din de dibînim. Ev tiştêkî li gorî dîtî û fikirîna mirovan e.

We di destpêka axaftina xwe de got

ku 'Bala min li ser edebiyat û resimê bû. Lê min resim tercîh kir'. Gelo ji bo we reng ji peyvankêstir bûn?

● Ji ber ku min dikaribû wêneyan baştir çêbikim. Min di dibistana seretayî de dest bi çêkirina wêneyan kir. Ji bo ku min portre baş çêdikirin, insan diktine rêzê, min portreyên wan çêdikirin. Her wiha min şîr jî dinivîsîn û ez ceribandinan (deneme) jî dinivîsînim. Ez ji muzîkê jî hez dikim. Ez beşên huner ji hev veneqetînim. Yanê tiştêkî xerf e, dema ji aliyê hunerî ve hîsa mirov diçe ser tiştêkî mirov nikare dev jê berde.

Mijara tabloyeke we li ser gerîla ye û tiştê ku em dizanin wê tabloyê di zanîngêhê de pir serê we êşandiye. Hûn dikarin li ser wê hin agahîyan bidine me?

nayê. Belê mijara tabloya min jî li ser pênc hîsên însanan bû. Tiştê ku van pênc hîsan herî baş nişan dida jî insan bû. Têkilbûn, tam standin, dîtî, hîskirin û bêhn hildan.

Min wêneyekî insanekî ku pênc hîsên xwe windakirine çêkir. Wan rojan di rojnâmeyan de wêneyê leşkerekî ku serê gerîlayekî qut kiribû û dabû destê xwe, derketibû. Min jî li ser wê mijarê insanekî ku pênc hîsên xwe winda kirine, çêkir. Rûyê leşker tune bû, yanê insanekî ku pênc hîsên wî tunebûn, min çêkir. Min ji Dîroka Çandê jî sîd wergirt. Min kadraja wêne cihê çêkir ku rê nedim ku ew rexne li min bigirin. Dema min tablo nişanî asîstan da. Wî eciband û ji min re got: "Divê tu ji van tabloyan çend heban çêbikî û pêşangeheke vekî" Ez şaş mam. Ji ber ku di zanîngêhê de prosedûrek heye û ew jî mecbûr in li gorî polîtîkayê bimeşin an na wê ji qoltixa xwe bibin. Qaşo tevî ku çepgir û hunermend bûn jî. Hinekane wêne ecibandin û gotin "baş bûye" lê mamosteya min tiştê negot. Piştî re hate ba min got: "Tu dizanî tu çî dikî?" Ez şaş mam. Piştî re got: "Te ev tablo ji wêneyekî girtiye." Jixwe mirov dikare ji wêneyekî jî bigire. Di vir de problem tunebû, lê armanca wê cihê bû. Armanca min jî jixwe ev bû ku tiştêkî bîvî rengî bînim rojevê.

Li ser vî wêneyî ji min re gotin "ew PKK'yî ye" jixwe dîtî û ramanên min ên siyasî jî kifş bûn. Mamosteya min ji min re got: "Bi çêkirina tabloyeke bi vî rengî tu dixwazî çî bikî, ez berpirsiya vî wêneyî hîlnadim ser xwe." Piştî re jî hundir derket, çû. Di dawiyê de ji min re gotin divê tu wêneyên bi vî rengî li Zanîngêhê çênêkî. Dema ku te zanîngêhê qedand, çêbike. Qaşo gîşk hunermend û çepgir bû. Piştî re ez hîn bûm ku mamosteya min qîza leşkerekî ye. Rojekê hat ji min re got, divê hunermend têkilî siyasete nebe, lê nikaribû xwe jê biparêze.

● Em di vê civakê de dijîn. Dema ku mirov derdikeve kolanan mirov pir tiştan dibîne. Mirov bi awayekî ecêb di bin tesîra jiyana însanan û heta ya heywanekî de dimîne. Li welatê me şerek heye, mirov tene kuştin, bi hezaran mirov ji welatên wan hatine dûrxistin, êş û jan dikşînin. Kêfa min qet ji van re

wLi holê rastiyek heye, hunermen-

Hunermend Güler Çınay di sala 1974'an de li Sêlçuka İzmirê hatiye dinê, lê bi eslê xwe kurd e. Ew resam e, wekî her hunermend û ronakbîrekî li hemberî şerê ku dewleta tirk li hemberî kurdan dimeşîne derdikeve, hestên xwe bi hunera xwe anîne ber çavan. Di sala 1996'an de leşkerên tirk ên ku serê du gerîlayên kurd jêkiribûn, dibin mijara tabloyeke wê. Tabloyê li ser pênc hîsên mirovan çêdike. Ew tabloya wê ji bo mezûntiya wê ya ji zanîngêhê jî bûye. Lê mamosteya wê tabloya ku wê çêkiriye qebûl nake û li ser wê tabloyê nîqaş dertên, piştî re jî wê di zanîngêhê de wekî endameke PKK'ê nişan didin.

Hevalê me M., Aksoy li ser hunermendiya wê û li ser mijara tabloya ku li ser gerîla çêkiriye, pê re hevpeyvînek pêk ani.

Hûn resmên çawa çêdikin, mijarên resmên ku hûn çêdikin li ser çî ne.

● Ez piranî resmên figûratîf yanê resmên însanan ên realist çêdikim. Bi awayekî din ez bi wêneyên xwe parçeyekî ji jiyane tînim ber çavên însanan. Hin kes resmên figûratîfên romantîk çêdikin, hin kes sûrrealist çêdikin, ji bo ku baş bînin xuyan, wan dixemilînin. Figûrên ku ez çêdikim jî ji nav jiyane ne, li ser êş û jana gel in, hinek jî hestiyar in.

Di wêneyên we de rengên taybet hene. Bi gotîneke din gelo rengê ku hûn bi taybetî bi kar tînin heye?

● Na, na dema ku hûn li ronansên bînhêrin, hin rengên sembolî hatine bikaranîn. Wekî mînak; di ronansê de



ine, jixwe mirî ye

en siyasî jî kifş bûn. Mamosteya min ji min re got: "Bi çêkirina tabloyeke bi e ji hundir derket, çû. Di dawiyê de ji min re gotin divê tu wêneyên bi vî k hunermend û çepgir bûn. Pişt re ez hîn bûm ku mamosteya min qîza têkilî siyasî nebe, lê nikaribû xwe jî biparêze.

dek wê tîne zimên. Li aliyê din jî dîsa hunermend heye lê ew naxwaze ev rastî were ziman. Gelo çima?

● Hunermend bi gotinê nabe hunermend. Guhê hinekan %100 dibihîze hinekan qet nabihîze. Çavên wan dibîne jî lê korin. Pirên wan ji bo ku tabloyan çêkin û bifiroşin, hunermend in. Her kes dizane lê li hesabê wan nayê. Naxwazîna bibînin. Naxwazîna nêzik bin.

Dema ku ji bo firotinê toblo bê çêkirin huner bi pêş ve diçe. Gelo di asta huner de negihîştina sewiyeya Ewropayê ji ber vê egerê ye?

● Na, sebeb ev tenê nîn e. Tirkiye yekcar ji aliyê meji ve paşverû ye. Hunera ku li Tirkiyeyê tê afirandin tu carî nikare were sewiyeya Ewropayê. Ji ber ku meji cihê ye, fikir û raman dîrî hev in. Dîroka Çanda Ewropayê çarsed sal in ku heyê, lê ya Tirkiyeyê ji salên 1940'î vir ve heyê. Ji ber vê yekê ji nişke ve Pîkaso, Mone dernakevin. Lewrê pêşketina hunerê bi pêşketina bi dîtina mirov ve jî girêdayî ye. Ji bo jiyana xwe divê ez bikaribim wêneyên xwe

birifosim. Pere mirov teşwîq dike, lê her tişt pere jî nîn e.

Van Gogh bi salan birçî maye lê piştî ku miriye tabloyên wî hatine firotin.

● Van Gogh ji birayê xwe alîkarî standiye. Lê mebest qezenckirina pereyan nîn e. Huner ji bo hunerê nîn e, huner ji bo gel e. Mirov li vê dinyayê ji bo çi dijin? Kirinên mirov ên erênî û neyî nî li ser mirovan tesîr dikin. Her wiha ev gişk mijarên hunerê û hunermendiyê ne. Mirovê hunermend nikare ji van dîr bisekine. Berî pêşîn berpirsiyeye civakî li ser milê wî/wê ye.

Ez dibêjim berî pêşîn huner ji bo mirov e. Divê mirov tatmîn bibe, ku bikaribe biafirîne. Divê mirov zewqê bistîne ku bikaribe çêbike.

Li gorî hin hunermendan divê mirov di nav gel de be ku bikaribe hunermendiyê bike, ji bo ku gel jî bikaribe biafirîne, hûn çawa dinirxînin vê yekê?

● Na, şertekî wisa nîn e li gorî min. Divê mirov li hemberî bûyeran bêdeng nemîne. Lê çewtiyek jî heye. Di nav

gel de resam wekî wênekêş tê dîtin. Resam wênekêş nîn e. Resam rastiya jiyane bi awayekî din dikare çêbike, heta dikare tiştên din jî bike. Wekî ez dixwazim di radyoyan de programên li ser resamiyê çêbikim û pêşangehan li kolanan vekim, li gorî min ev bêhtir li ser mirovan tesîrê dike.

Gelo mirov dikare çirokeke bixwîne û tabloya wê romanê çêbike?

● Ji wê re îlistirasyon tê gotin, yanê ew dixwîne, wê çirokê resim dike. Ev karê min nîn e. Ez resam im. Ez dikarim wê jî çêbikim, lê armanca îlistirasyonê cihê ye. Hin hene pir baş in, hin jî xirab in, lê qîmeta wê ya hunerî nîn e. Her kes nikare çêbike.

Di van salên dawîn de hin programên kompûteran derketine holê ku li ser wan wêneyên pir baş tên çêkirin.

Gelo ev ê rê li ber resaman bigire?

● Li gorî min wê bêtir hunermend derkevîne holê. Ji ber ku ew bêhna mirov li ser xwe nagerîne, dengê mirov li ser xwe nagerîne. Dibe ku baş bê xuyan, lê mirov demeke dirêj nikare jî tiştên wisa zewqê bistîne.

Di vir de girîngiya firçeyê dertê holê, ne wisa?

● Ji ber ku hûn dikarin bi xêzên firçeyan ji rewşa huner-



mend fêm bikin. Wekî minak, Van Gogh ji xêzên firçeyên wî tê fêmkirin ku kîjan tabloya xwe bi kîjan psikolojiyê çêkiriye. Yanê tabloya ku bêhna boyaxê jê neyê, ji wan re mirov nikare bêje huner ji ber wê yekê jî girîng e.

Hûn van demên dawîn qet çûne Kurdistanê?

● Ez di biçûktîya xwe de çûbûm, lê wekî xeyalan tê bîra min. Wekî filmekî di ber çavên min re derbas dibe. Bi qasî ku tê bîra min, pir xweş bû. Ez dixwazim herimê. Dibe ku ji bo min bibe sedema wêneyên pir xweşik.

Hûn resimên latûrmort jî çêdikin?

● Na ez nikarim tiştê ku hereket neke çêbikin. Qet li xweşiya min naçe. Ez dixwazim her tim tiştên ku hereket dikin, çêbikim.

Lewrê wêneyên Ibrahim Çallî pir baş pere dikin?

● Ibrahim Çallî piranî wêneyên Stenbolê çêkirine û îro piyaseyê wan wêneyan çêbûye, pere dikin. Lê mirov îro rabe wêneyên Stenbolê çêbike, xeynî beton û behreke qirêj çi heye? Hin jî ji ber vê yekê wêneyên wî pere dikin, lê firotina wî resmî, başbûna wê nişan nade.

Kenan Evren jî resiman çêdike, gelo hûn qet fikirin tabloyeke wan 27 kesên ku wî dane daliqandin, di bendekî de daliqandî çêbikin bişînin?

● Belê ez dikarim niha jî çêbikim, lê mirov dema tiştêkî wisa bike qîmetê dide wî kesî. Ew kesekî layîqî qedir û qîmetê nîn e. Her wiha wêneyên wî pir xirab û nebaş in. Medya çiqas bala xwe bide ser jî ev rastiyêke.



Tabloyên Güler Çınay ku li ser rastiyên jiyane çêkirine.

Bî kurdî nivîsandin helwesteke siyasî ye

Ibrahim Seydo Aydoğan, Beşa Wêjeyê ya Zanîngeha Dijîleyê qedandiye, niha mamosteyê dike û di Kovara Jiyana Rewşen de xebatên xwe didomîne



Gava ku ji me re, ji Başûr û Başûrê Bîçûk nûçeyên li ser "Şevên Toreya Kurdî" dihatin, me keser dikişandin û me di dilê xwe de digot. "Xwezî li Bakur jî!" Ji ber ku ev şev nîşaneyê pêşketin û xurtbûna wêje û çanda kurdî bûn. Di heman demê de helbest ji bo belavbûna zimanekî roleke gelekî girîng bi cih tînin. Ji ber ku hest û ramanên mirov bi şeweyekî herî zela xwe di helbestan de didin der. Helbest ziman diparzinîne û ziman bi helbestan xwestir dibe; ziman bi rê dikeve.

Ibrahim Seydo Aydoğan û Kawa Nemir, ku di nav Kovara Jiyana Rewşen de xebatên xwe yê wêjeyî û hunerî didomînin ji ber heman sedemê dest avêtin karekî bi vî rengî. Roja 22 kewçêrê Kawa Nemir û Ibrahim Seydo Aydoğan li ser jiyana helbestvanên kurd Cegerxwîn û Osman Sebrî semînerêk pêşkêş kirin. Aydoğan û Nemir di şevbûherkê de digel helbestên Cegerxwîn û Osman Sebrî ji helbestên xwe jî çend heb xwendin. Di dawiya şevbûherkê de diyar bû ku, beşdar pê dilxweş bûne. Ji ber ku helbestên her du helbestvanan ji wan xwestin. Her wiha digel pêşbîniyên reşbîn, têkildariya beşdaran xurt û geş bû. Jixwe roja 26'ê kewçêrê Aydoğan û Nemir ji ber daxwaza rayedarên HADEP'a Bakirköyê heman semîner li wê derê jî pêşkêş kirin. Dîsa wê piştî mehekê şevbûherkê li şaxa NÇM'ê ya İzmirê jî saz bikin.

Me der barê şevbûherkê, helbestvaniya wan û rewşa çand û wêjeya kurdî de hin pirs arasteyî wan kirin. Wekî ji we re nas e, gelek helbestvan û nivîskarên kurd bi zimanê tirkî dinivîsin. Ji wan hinekan jî diyar kir ku, ew jî ji ber vê yekê bextewar û dilxweş in. Lê, Aydoğan û Nemir di vî

Wekî nas e gelek helbestvan û nivîskarên kurd bi zimanê tirkî dinivîsin. Ji wan hinekan jî diyar kir ku, ew jî ji ber vê yekê bextewar û dilxweş in. Lê, Aydoğan û Nemir di vî warî de xwedî helwesteke tûj û tund in.

warî de xwedî helwesteke tûj û tund in. Her çiqas her duyan jî bi zimanê tirkî dest bi helbestnivîsinê kirine jî, lê niha li dijî zimanê tirkî helwest girtine. Jixwe bi tirkî nivîsandin ji dilê wan nedihatîye.

Ibrahim Seydo Aydoğan berî vê bi demekê helbestên xwe yê bi tirkî ji bo çapê dane Weşanxaneya Aram. Lê ew niha naxwaze ev pirtûk bê weşandin. Wî çapa wê daye rawestandî. Aydoğan got ku, helbestên wî yê bi tirkî di kovarên wekî Însancil, Berfin Bahar de hatine weşandin. Ev helbest ji aliyê gelek helbestvanan ve hatine ecibandin. Aydoğan li ser, nivîsandina bi zimanê kurdî diyar kir ku, ziman bîngeha hunerê ye. Bikaranîna zimanê kurdî helwesteke siyasî ye. Li gorî wî, ku helbestvan bi kîjan zimanî di-



Kawa Nemir, Zanîngeha Stenbolê beşa Zimanê û wêjeya îngilîzî dixwîne, her wiha ew jî di Kovara Jiyana Rewşen de xebatên xwe didomîne

kê gotina romanivîsê kurd Helîm Yûsiv; "Zimanê kurdî zimanê dilê me ye bi bîr xist" got ku yê ku li dijî sistemê derdikevin divê bi bi kurdî binivîsin.

Li ser kêmasî û rexneyên li xebata wan tînin girtin jî wan diyar kir ku, her çiqas wan gelek kes agahdar kirine û xwestine çalaki berfirehtir bibê jî, lê kes beşdar nebûye. Li aliyê din Aydoğan û Nemir rexneya kesên ku helbestên wan wekî "helbestên ji giyana şoreşê dîr û romantîk" bi nav dikin, bi awayekî tund red kirin.

Kawa Nemir bal kişand ser pêdiviya bi peyvên listinê û got ku, ziman bi vî awayî bi pêş ve diçe. Li gorî Ibrahim Aydoğan hunermendê herî pêşketî û zana yê ku çavên xwe ji şer re negire ye. Her wiha Aydoğan daxuyand ku, hunermend gel dawet nake, divê here cem gel.

Wekî tê zanîn piştî ku helbestvanên tirk helbestên xwe di kasetên de xwendin, li Tirkiyeyê pirtûkên helbestan bêhtir hatin firotin. Li ser pirsar me ya di vî warî de, Kawa Nemir, Ibrahim Seydo Aydoğan gotin ew jî dixwazin xebateke bi rengî bikin, ji bo vî ew ji kesên berpirs alîkariyê dixwazin. Wan diyar kir ku, bi kasetan aliyê hestiyarî yê helbestan xwe bêhtir dide der. Wekî mînak jî gotin ku di dawiya şevbûherkê de beşdaran ji wan helbestên wan xwestine. Her wiha du helbestên Ibrahim Seydo Aydoğan ji aliyê Komara Amed ve hatine bestekirin, wê di kasetê de da cih bigirin. Li ser pirsar me Aydoğan diyar kir ku, ew dixwaze helbestên xwe ji Ciwan Haco re jî bişîne. Aydoğan jî wekî Haco nexweşê Amedê ye. Ew dibêje: "Ez naxwazim herim Amedê, dixwazim bêriya wê bikim."

AMADEKAR: MAZLÛM DOĞAN

nivîse, xwe nezîkî wî gelî dibîne. Aydoğan wisa axivî: "Divê helbestên min bigihêjin çar aliyên Kurdistanê û di sînorên çêkirî re derbas bibin."

Em zarokên şoreşê ne

Şerpehatiya Kawa Nemir ya li ser zimanê kurdî balkêş e. Ew bêhtirî deh salan bi kurdî neaxiviye û wî kurdî jî bîr kiriye. Lê, niha ew bi kurdî dinivîse. Naxwaza bi tirkî binivîse. Kawa Nemir, berî vê bi demekê bi helbesta xwe yê bi navê "Salname" di pêşbazîya TAYD-DER'ê de xelata yekemîn wergirt. Ew helbestvaniya xwe bi şoreşa Kurdistanê ve girê dide û xwe wekî zarokê şoreş bi nav dike. Kawa Nemir nixandînen wekî "em asîmîle bûne" di cih de nabîne. Wî li ser vî ye-

Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

- 01.11.1997. **Semî:** Konsera Hozan Baha Şexo. (Ji Başûrê Biçuk) saet: 17:30
- 02.11.1997. **Yekşem:** Konsera Mahmut Kızıl (Dengbêj) saet: 17:30
- 05.11.1997. **Çarşem:** Panela Înstîtuya Kurdî. "Zargotina Kurdî" Lêkolîner- Nivîskar Ahmet Aras. saet: 18:00
Li BEKSAV'ê
- 03.11.1997. **Duşem:** Film. "Viva Zabata" Derhêner: Elia
- 06.11.1997. **Pençşem:** Film. "Faşizma Asayî" Derhêner:

Çalakiyên heftayê



Michail Romm. saet: 18:30

Li NCM'a İzmir'ê

- 30.11.1997. **Duşem:** Konferans "Ji doh hate îro Susurluk" Amadekar: Rojnameger-Nivîskar Varlık Özmenek saet: 18:00
- 04.11.97. **Sêşem:** Konsera Koma Amed. saet: 18:00
Li NCM'a Mersin'ê
- 01.11.97. **Semî:** Teatra Jiyana Nû. "Rojbaş" saet: 15:00
- 02.11.1997. **Yekşem:** Teatra Jiyana Nû. "Rojbaş" saet: 15:00

Teoriya kompoyê

Nasnameya film:
Derhêner:
Richard Donner
Lîstikvan: Mel
Gibson, Julia
Roberts
Senarist: Brian
Helgeland
Navê orijînal:
Conspiracy
Theory



Dibe ku Tirkiyeyê navenda fezayê NASA'ya Amerîkayê kirê kiribe û bi riya peykê (uydu) erdhejekê li Kurdistanê pêk bîne. Hûn jî berî vê yekê xwe amade dikin.

Rojekê hûn li bajarekî Kurdistanê, di kûçeyekê re derbas dibin. Ew kûçe jî reş û tarî ye. Dengê lingên yekî tê guhên we. Hûn jî jixweber hin teoriyên kompoyê diafirînin, wekî ku ew kes bi pey we ketiye, dixwaze ku we bikuje. Li Kurdistanê fikirîna tiştêkî bi vî rengî gelekî asayî ye. Carina jî dewlet hêzên xwe yê veşarî, dixwe pey mirovekî kurd û da ku wî bide kuştin. Ew jî dixwaze ku vê planê têk bibê. Dibe ku Tirkiyeyê navenda fezayê NASA'ya Amerîkayê kirê kiribe û bi riya peykê (uydu) erdhejekê li Kurdistanê pêk bîne. Hûn jî berî vê yekê xwe amade dikin. Her wiha hin tiştên ku hûn hîs dikin, carinan rast derdikevin û dibin sedema mirina we jî.

Li ser kurtenûçeyên ku di rojnameyan de derketine, hûn teoriyeke xwe diafirînin û van teoriyên xwe ji hin kesên bi hêz û navdar re dişînin û çend aboneyên xwe bi vê yekê peyda dikin. Lê carinan jî ji ber van teoriyên we, bi çavê dînan jî li we tê meyzandin. Hûn bi teoriyên xwe dixwazin hin tiştên veşarî yê CIA, FBI û hwd. derxin holê, mixabin wekî ku me li jorê diyar kiribû, ew tiştên ku hûn dizanin, carinan dibin sedema mirina we.

Nivîskarê amerîkî George Orweelle dema di pirtûka xwe ya bi navê "1984" an de, pêşbîniya "wê Sovyetistanê di sala 1984'an de belav bibê" nivîsibû, her kesî henekên xwe bi vê pêşbîniya wî kiribûn, bi çavê dînan lê nihêrtibû. Lê piştî ku teoriyên bi vî rengî rast derketin, afirînerên van teoriyên kompoyê jî zêde bûn.

Belê her wekî jî pêşekê jî diyar e, mijara filmê bi navê "Teoriya Kompoyê" ye. Derhênerê vî filmî Richard Donner e, li ser teoriyên

ajokarekî taksîyê hatiye avakirin. Ajokarê taksîyê yê New Yorkê Jerry (Mel Gibson) di film de, ji hemû rêwiyan xwe re qala teoriyên xwe dike, hinek bi çavê dînan, hinek jî dibêjin mêtîyê vî çelqiyayê. Belê ev paranoyakê New Yorkê Jerry ji ber gumanan wextê di kuleka xaniyê xwe re, bikeve hundirê mala xwe. Balkêş e hemû tiştên xwarin û vexwarinê di nav qutiyeke de kilîtîkirî ne. Her wiha mala xwe bi awayekî xemilandiye ku bombe jî nikaribin dîwarê xaniyê wî qul bikin. Belê ev yek nişan dide ku, divê her kes li di her warî de hişyar be. Ev ajokar carinan wekî mirovekî nezan, carinan jî wekî filozofekî tê xuyan. Ji aliyê din ve gumanar serê wî bi CIA'yê re dixwe belayê.

Ajokarê ku bi giştî belengaz xuya dike, li ser CIA û FBI'yê hin teoriyên wî hene. Di teoriya xwe de dixwaze eşkere bike ku CIA teknolojiya pêşketî ji bo berjewendiyên xwe li ser mirovan bi kar tîne û wan dike kujer.

Her wiha di vê navbere de, dîmenên erjeng û sosret ên film bêhna temaşevanên diçikînin, efekt û bûyerên ku li ser hev diqewimin, nahêlin ku temaşevan bi rêkûpêkî hilmekê bikîşîne û çavên xwe bileqîne.

Bi rastî Mel Gibson derûniya paranoyakan di film de bi şeweyekî hostatî bi çih anîye. Di nav film de bûyerên pêkenokî film bêhtir bi yekî dide hezkirin. Di film de bi awayekî zêlal tê dîtî ku çawa teknolojiya mirovan dike hesirê xwe û CIA bi riya vê teknolojiyê mirovan çawa li gorî berjewendiyên xwe bi kar tîne. Film dike ku mirov her dem hişyar be û hay ji xwe hebe.

AZAD ALTUN

TÎŞK

Azadiya eşkerakerdena
fikirî û Tirkiyeya
"tewr" e



LERZAN JANDİL

Serê hardan ra sistemê dewletan yê ciya ciya estê. Nameyê tayîne monarşî yo, yê tayîne teokrasî yo, yê ê bînan faşizm o, yê tayîne jî demokrasî yo. Bêguman mordemî nê bingeqeseyî estê ebi kêfê xo nêvatê. Mana û şertê her bingeqeseyî estê. Cawo hop hazir de mordem nêşikîno yew dewlêde faşîste ra dewlêde de demokrate yan jî teokratike bivaco. Tabî nê çî seba halanê û dewletanê normalan re derbaz bêne. Seba hal û dewletanê nenormalan re nê bingeqeseyî, yan jî xebetnayena nînan nêbena.

Dewleta tirkî maşuqê demokrasî ya. Pîl û qijê dewleta tirkî, yan jî ebi vatenêde bîne "Cumhuriyeta Tirkî" her ca de vanê, îdîa kenê, ke dewleta dînan dewlêde "tewr" demokratîk a. Çimke her çiyê dînan, "tewr" girs a; a "tewr" hemdem (çağdaş) a; a "tewr" rêberê şaranê bînan a; a "tewr" musulman/laîk a û a "tewr" tirk a. Ê eke dewlete niya biyê, wayirê dayê jî "tewr" girs ê; politikavanê dayê "tewr" hemdem sosyal demokrat ê; serokê dayê "tewr" tirk ê.

Ma eke her çiyê na dewlêde sare û pay ra niya "tewr" bo, çiyê ke naca benê jî ganî "tewr" bê û raştîyê de jî hênî benê. Yanê çiyê ke zerê sîndorê na dewlêde de benê, çiyê "tewr" ê.

Qezeyê trafikî "tewr" e. Mafya, "tewr" e. Qirêj û nuspetiya ehlaq û politîka "tewr" ê. Xokîştên (intihar) "tewr" o. Yanê demokrasîyê Tirkiyê-demokrasîyê de "tewr" demokrasî yo.

20 na aşme de Eşber Yağmurdereli ebi zaf medodanê û kayanê nenormalan amê guretene. Kaleka xirabî û şermê guretena. E. Yağmurdereli de çiyêde bîni amê mi vîrî. O jî guretena vekîlanê HEP'î û zafîyê jî zerê ereba kerdena Orhan Doğanî biye.

Tawo ke ma biwazîme na dewlêde ebi dewlêde bîne bişanîme têver, ma dewlêde niyanêne nêvînenîme. Serê hardan ra pe yew dewlêde zê Cumhuriyeta Tirkî çîna. Çimke eke niyamê re îşê dayê, îmxo xo ra jî înkâr bena. Zê împaratoriya Osmaniye ebi dirûtiye kena.

La belê mîsalêde klasik esto. Vanê ke, yew cênike ya ere domana nêweş a (hamile wa) yan jî ere domana nêweş niya. Wertê nayê, kaleka nayê, pê naye, verê naye çîno. Zê nê mîsalî ya, sistemê yew dewlêde demokrasî yo, yan jî niyo.

Eke komara tirk "tewr" demokratîk bo, şima ra nêpersêne;

Ma dewlêde demokratîke de seba erezonardena îfade kerdena bawariya xo kam kuna hepsa?

Kamcî dewlêde de demokratîke de ebi entrika, dubara û bêbextiye mordemî erzîne hepis, komelî ênê guretene, muhalîfî ênê dîskalîfîyekerdene? Kamcî dewlêde demokratîke çimverdana hardê cîrananê xo, şenikîyanê wertê xo qedênena? Kamcî dewlêde demokratîke de monopolê şidetê dewlêde, zê terorî şarî sero êno xebetnayene, hem jî ebi het, yanê teyan hîrê 'K' (komunîst, kurd, kizilbaş) yan ser ro? Kamcî dewlêde demokratîke de çayê îbadetê şarê şenikî êno guretene?

Qe yew dewlêde de nê çî nêbenê. Teyna C.T. de benê. Nivîskara, Entellektuela, Sendikavana, Çepa yanê ebi kilmiye xêca xo ra her kesî erzen a zere; kilît dana çêverê dêranê Aşuriyan ro; xêca îdeolojî, dîne û şarê/miletê resmî ra qe çiyê nas nêkena, tolerans nêmuşnena ci ser de jî "tewr" demokrasî ya...

Nameyê na dewlêde "demokratîk" bo jî ebi ked û emegê kesanê zê E. Yağmurdereli, î. Beşikçi û ebi tekoşîna şarê kurdî taba şaranê bînan pêniya demokratîkiya naye rojê êno. Wa na dewlêde "tewr" ere naye bawer bo.

Destana Tahir û Zahirê (3)

Tahir hiş û aqilê naşîniyê ji ser xwe avêt. Di xwe ber de got:

“Ez lawê wezîrê vî bajarê han bûm. Ger ji bo xatirê Zahirê ez nefî nebûma, çar sal paşê ezê wezîrê vî bajarî bûma. Lê, êdî çiyê min maye ku ez winda bikim. Ezê ji eşqa dilê rezîl stranek bi-avêjim ser. Ger ev Zahirê be wê xwe bide der.

Lê, de banî banî lo de dilo banî
Lê, ez çûm hundir min jî te re qedeh anî
Lê, tu yê zêde dirav bidî ger tu
pê bizanî

Lê lê qîzê tu keça mala mezin
Lê ma ev çi ye? Qedeha çayê li destên
te dilerizin
Lê ger tu li xwe bêyî mukirî bêyî Zahir
tu yî, Tahir ez im

Wê demê Zahirê jî Tahir dinase û wî
dibersivîne:
Lo Tahir ez bi qurban şevên me xweş
bûn, lê êvar hatî
Bila şewq û seravê tu car xwe nedana
vî welatî
Ez bi qurbana wê rîya ku tu tê de hatî
Tu çima hew qas li bajarê Mûsil mayî,
tu dereng hatî?

Lê lê Zahirê çima tu naçikî, tu nagirî
Bejna te wek sorguleke Muhammedî
Dilê min evdalê wek çemê Feratê hat
û lê hêwirî
Êdî ez lavayîyan nakim ji Xwedê va ye,
tu sebra min î

Tahiro ez bi qurban zozanên me
bilind in berfê lê kir
Tu hatî qet rê neman, çixiran tê kir
Te berê xwe dabû bajarê Mûsilê koç
bi rê kir
Gelo, te temiya Zahira naçar lê kê kir?

Zahirê bejna te zirav e weke minara
pêşberî kelê
Lê te digot çî, min digot belê
Bila di hawariya min û te de bîn
Hesen û Huseyn şehîdên Kerbelê.

Tahiro ez bi qurban, ez serçaviya çem
û kaniyan
Şewqa zêr û zîvan li hundirê hemamê
dabû ser û çavan
Were em li kêleka hev rûnin, derbikin
kul û derdan
Karê dinê çî teres e li ser malê zêde
zênê kê m e

Lê Zahirê ez ji teyrân teyrê hûr im
Baskên min weşiyane, ez nikarin
bifirin
Ger mirov li qisûrên dinê binihêre,
qisûr pir in
Herçî bi hevalên xwe re rast bin, bila bi

pel û baskên xwe bifirin
Lo de bila mirin heba, dil tûneba
Mala me dîsa cîranê mala we ba
Dîwarê li navbeyna me xera biba
Sibê êvaran çavên min bi bejna te ba
Bila Azraîlê'm li ser singê min peya
biba

Wê demê bila mirina min li beriya te ba

Zahirê keça mîrê Palo gazî xwediyê
hemamê kir. Got: “Ev xortê han merivê
me ye. Ji malê xeyîdî ye. Ezê perê te bi-
dim, ger heqê te lê heye.” Xwediyê he-
mamê got: “Na perê min lê tune ye. Ev

de dijîdîne.
Berê wî dane girtîxana bajarê
Mêrdîn e
Hawar gidî vê sibehê ceza giran
lê birîne


Lo de yan e yan e, lo dilo yan e
Derdê min ji alî Xwedê ve pir giran e
Ne îlac û ne hekîm û ne derman e
Xelex û zincîr û lele di ser de

berdane
Sed û yek sal ceza lê birîne û dane
Berê wî dane bajarê Mêrdîn girtîxane
xwîniyan e

Lo de şev e şev e, lo de dilo şev e
Lê Zahirê êdî ji min re ne roj û

ne şev e
Tu hêviya min tunîne ku ezê ji vir
derkevime
Ji meraqa te delaliyê Girtîxana Mêrdîn
li min hatî hev e
Dilê min weke pêlên behra Wanê
li hev dikeve

Dîsa bi fermana Xwedanê rehman e.
Xoce Xizir siwarê bozê tê û Tahiro jî
hundirê girtîxana Mêrdînê deranî.
Hiş û aqil ji evîne êdî li serê Tahir



çend roj e ew li ba min dixebite. Ger
rastiyê bipirsî ez jê re deyndar im.” Za-
hirê şaleke pîrekan li Tahir kir û ew ha-
nît qesrê ku li oda xwe veşêre.

Hîn du roj di ser wan de derbas ne-
bûn, Erebo Xoce bi vê rewşê hesiyabû.
Ereb Xoce rabû çû cem mîr. Got: “Ma
ev çi rewş e, qaşo te Tahir nefî kir? Tu
wa yî li ser textê xwe dikî kar. Lê Tahir
wa ye li hembêza keça te dike yar.”

Mîr ferman derxiste li nobedar
Çûn Tahir derxistin ji bin serdirê
Hanîtinz (anîn) hizûra mîr
Mîr û wezîran kirin şewir
Li qeyd, lele û kelemçan xistin dest
û lingên Tahir.

Berê wî dan girtîxana Mêrdînê mes-
kenê xwîniyan qawîşa dêr.

Dema Zahirê vê yekê dibîne cardin
kul û kederên xwe-bi strana rêz dike û
dirijîne:

Ê de bîne bîne, lo de dilo bîne
Xwedêyo ya ez dibînim bila kes nebîne
Xwedê mala Erebo Xoce û mîr
bişewitîne
Çawan destên Tahirê min di kelemçan

Tahiro ez qurban, ez nîzanim êdî
silavan li kê kim
Ezê silavan li nav destmala sor û zer
kim
Ezê peyakî lawê bavan ji xwe re
peyda kim
Li qawîşa dêrê meskenê xwîniyan
belav bikim
Kul û derd û meraqên xwe pê der bikim

Mehkûm û xwîniyên girtîxana baja-
rê Mêrdîn li dora Tahir civiyane. Gotin:
Tahiro, lawo cezayê te çî ye û kîjan e?

Tahir xwe berda ser çokan e.
Got: Dêrdên min pir in, kulên min gi-
ran in.

Ceza min ji kişandine derdê dilan e
Ne diya min, ne bavê min, ne ke-
sê'm heye, ne biran e

Baskên min tune ne, purtên min we-
şiyane

Ereb Xocekî ketiye pey min bi îftî-
ran e

Tahir jî, kul û keder û xemên xwe bi
stranan dirijandin nav girtîxaneyê baja-
rê Mêrdînê:

nemane.

Weke dînan jî nav bajarê Mêrdînê
pêxwas dide ser rîyan e.

Tê, digihêje bajarê Palo ber qonaxa
Zahirê nivê şevan e...

Çendekî wan bi hev re diqedin ku
hîn bi mirazên xwe şa nebûne. Erebo
Xoce careke din pê dihese û dihere ber
mîr dibêje: “Mîrê min ma ev hefskirina
te çawa hefs e? Qaşo, te Tahiro hefs ki-
ribû lê, waye li oda keça te û ji xwe re
dike kêf û seyranê.”

Mîr ferman da, got: “Wî bigirin bî-
nin, evcar ezê serê wî jêkim.”

Leşker, diherin Tahir li bin sedirê di-
qefêlin. Bi fermana wî dibin li nav
meydana bajarê Palo û serê wî datînin
ser kevir. Zahirê ku pê dihese, dike ha-
war û qîrîn xwe diavêje ser Tahir. De-
ma celad şûrê xwe diavêje serê herdu-
wan jî dikeve ber şûr. Dema gel bala
xwe didin ku, cotek kevok ji nav singê
wan derketin û dane firê. Xoce Xizir si-
warê bozê, wê demê li Erebo Xoce dike
nifir. Erebo Xoce jî, li ber lingên wan di-
be yek kevir. (Qediya)

BERHEVKAR: ROŞAN LEZGÎ

Êşa Hadepe Jana Amedê

Dîroka gelê kurd dîrokek pir bi êş û elem e. Bi sedan bûyerên trajîk ên wekî, Zilan, Dêrsim, Agirî û hwd. kuştin, koçberî, zilm û zordestî dibe parçeyek ji jiyana wan. Lê belê li gor ewqas trajediyên mezin berhemên derbarê wan bûyeran de gelek kêman in. Ji ber ku çanda gelê kurd a nivîsandin û nivîskariyê qels û lawaz maye. Berhemên ku hene jî bêhtir bi zimanê serdestan hatine nivîsandin. Diviyabû li ser wan bûyeran ji her cureyî nivîs bihatana nivîsandin ku gel jî dijminê xwe baş nas bikira û êş û jana ku bav û kalên wan kişandine baş fêman bikira. Ev peywir jî bêguman dikeve ser milê nivîskar û ronakbîran.

Siracettin Kırıcı wekî siyasetvan û rewşenbîrekî kurd her çiqas nivîskarî ji xwe re wekî kar nehesibandiye jî, bûyerên ku bi serê wî de hatine nivîsandina wan ji xwe re wekî peywirekê dîtiye. Ev serpêhatiyên xwe di bin navê "Êşa HADEP'e Jana Amedê" de kiriye pirtûk. Siracettin Kırıcı 1977'an di komela DDKD de dikeve nav xebata siyasî û ji heman dozê de dema Esat Oktay Yıldırım de li Girtîgeha Amedê radizê. Piştî jiyana girtîgehê di damezrandina HADEP'ê cih digire û bû cîgirê sekreterê giştî û heta kongreya duyemîn ev karê xwe domand. Wekî tê zanîn di vê kongreyê de prakasyona alê hate lidarxistin û ew tevî rêveberiya HADEP'ê hate girtin û 9 mehan di Girtîgeha Elmadağê de ma. Siracettin Kırıcı jî ev pêvajoya ku di Girtîgeha Amedê û Elmadağê de derbas kiriye dide ber rewşa Girtîgeha Amedê ya dema 12'yê rezberê. We-

kî tê zanîn di wê demê de dewlet bi hemû hêz û hoviya xwe li ser girtiyên zilm û zoreke mezin dide meşandin. S. Kırıcı jî wek şahidekî wê dema zor dijar e.


S. Kırıcı serê pêşîn li ser sedemên provakasyona alê radiweste. Digel vê yekê Kırıcı balê dikişîne ser kêmasiya organîzasyonê û derûniya girseya ku tevî kongreyê bûye. Dû re ew qala nêzîktêdayîna hêzên dewletê dike û vê nêzîktêdayîna bi serpêhatiyên xwe yên li Girtîgeha Amedê rûberî hev dike. Bi van rûberiyên re ew he-yama Esat Oktay Yıldırım; zilm û zora li ser girtiyên Girtîgeha Amedê, berxwedanên li dijî

Siracettin Kırıcı wekî siyasetvan û rewşenbîrekî kurd her çiqas nivîskarî ji xwe re wekî kar nehesibandiye jî, bûyerên ku bi serê wî de hatine, nivîsandina wan ji xwe re wekî peywirekê dîtiye.

wan kiryarên hovane, îxaneta girtiyên, atmosfera girtîgehê û kiryarên Yıldırım ên hovane tîne zimên.

Pirtûk ji layê Weşanên Sor ve hatiye çapkirin û ji 188 rûpelan pêk tê. Dema mirov bala xwe dide pîrbûna çewtiyên rastnivîsê û kêmasiyên di honandinê de, mirov dibêje qey pirtûk bi lez û bez hatiye weşandin. Her çiqas vê yekê tama xwendinê kêman kiribe jî ji bo agahdarbûna li ser weşata li Zindana Amedê ya 12 rezberê û provakasyona alê divê ev pirtûk bê xwendin.

Ev pirtûka Kırıcı ya yekemîn e, piştî vê pirtûkê jî Kırıcı bi navê "Nalîna şevê" pirtûkeke helbestan derxist. Helbestên wî bi pîranî li ser evîn, doza neteweyî



û welêt in.

Weşanên Sor
İstiklal Cad. Terkos Çıkmazı
Karaaslan Apt. Kat:1 No:12
Beyoğlu/İstanbul

BARAN LALEŞ

Kî dibêje li Tirkiyeyê demokrasî tune?

OSMAN ÖZÇELİK



Li Tirkiye demokrasî heye. Di ser de jî, heta tu bêjî: "Bes" demokrasî heye. Heger demokrasî navê sistema ku rêveberiya gel, hêza xwe ji gel digire û rêveberên welêt bi destê gel tîne hilbijartin be, li Tirkiyeyê demokrasî heye. Heger hûn li demokrasîya ku Lincoln tarîf kiriye, "idareya gel, bi destê gel û ji bo gel e" bigerin, ew jî heye.

Na ku hûn dibêjin ji bo hebûna demokrasîyê ev têrê nake û hindê "norm" hene ku bêtir wan mirov nikare behsa demokrasîyê bike, em dikarin wan jî bînin holê û li ser rawestin.

Ji bo ku mirov bikaribe bêje demokrasî heye, divê mafên mirovan yê navneteweyî hebin û hemû mirov li hemberî qanûnan wekhev bin. Cudatiya sê hêzên bingehîn (dadgerî, rêveberî, parlamento) hebe, dadger û dadgeh azad bin. Pîrpartîti hebe û hilbijartinê serbest û tevahî bêtir bêtir meşandin. Li ser her mijarê, azadiya eşkerekirina bîr, bawerî û ramanan hebe. Sazkirina rêxistinên siyasî, aborî, civakî û çandî ne qedexe be. Ya herî girîng dewlet di xîzmeta gel de be.

De hêla ji min re bibêjin, kî dikare bêje li

Tirkiyeyê pîrpartîti tune. Ji çepgirên radikal, heta rastgirên radikal, ji bîstî pirtir partî hene. Her partî bi serbestî dixebite, propandayê dike, beşdarî hilbijartinan dibe. Li Tirkiyeyê kîjan partî qedexe bûne, kilît li deriyê kîjan partîyê ketiye. Rêveberên kîjan partîyê hatine mehkûmkirin, zîndankirin an jî sirgûnkirin?

Li Tirkiyeyê çend kes ji ber dîtin û ramanên xwe di girtîgehan de ne, an di dadgehan de tîne mehkûmkirin? Mafê çend mirovan binling bûye û bêceza mayen. Hûn dikarin ji min re bibêjin be kîjan qanûnê cudatî kiriye nav mirovan, yan li ku deverê Tirkiyeyê qanûnên taybetî û herêmî tîne meşandin?

Kî dikare bibêje polis û cendîrme zilmê li gel dikin? Hûn dikarin biqîrin: "Ma çawa, polis û cendîrme zilmê nakin!" Belê ez dîsa îdia dikim; polisên dewletên demokratîk ên wekî Almanya, İtalya, Fransa û hwd. çiqas zilmê dikin, polisê Tirkiye jî ewqas zilmê dikin ne pirtir...

Heke mirov destê xwe deyne ser wîjdanê xwe û wisa biaxive, ma mirov dikare bêje, hilbijartin (çi heremî û çi yê tevahî) demokratîk derbas nabin? We tu caran dîtiye ku polis û cendîrme bi cilên xwe yê fermî û bi çek çûne ser sindoqên hilbijartinê û bi tirsandina hilbijêran raya gel li gorî daxwaza xwe guherandine?

Eşkere ye ku ez behsa demokrasîyê îdeal, bêqisûr û bêtir bêtir nakim. Jixwe li tu dewletên dinyayê demokrasîyê wilo hîna ava nebûye. Belê em dikarin demokrasîya Tirkiye û ya "dewletên demokratîk" rûberî hev bikin. Jixwe ez jî li van dewletên "demokratîk" dinêrim û dibêjim

li Tirkiyeyê jî demokrasî heye. Piştî ku demokrasîyê bêqisûr nemeşiya, ha piçekî kêman, ha piçekî zêde. Bi kurtayî demokrasîya Tirkiyeyê, ji ya dewletên demokratîk gelekî ne dîr e.

Bi xwezayî mafê we heye ku hûn bipirsin: Ger demokrasî hebe, ev DGM (Dadgehên Ewlekariya dewletê) û MGK (Konseya Ewlekariya Neteweyî) çi ne? Hûn dikarin pîrsa rewşenbîrên di girtîgehan de jî bikin û hin bibêjin İsmail Beşikçi û Eşber Yağmurdereli ji bo çi di girtîgehan de ne? Pîrsa zilma li Girtîgeha Amedê, bi îşkenceyan kuştina mirovan jî mafê we ye. Divê bersiva pîrsa qedexekirina partiyên legal (TİP, TBKP, SP, HEP, DEP, ÖZDEP, DDP) jî bê dayîn. Rast e. Divê em bersiva hemû pîrsan bidin.

Yek bersiv heye. Em qala Tirkiyeyê dikin. Ne Kurdistanê. Heke mirov kurdan û Kurdistanê ji tîrkan û ji Tirkiyeyê cuda nefikire, mirov dibêje qey li tu deverê Tirkiyeyê demokrasî tune. Ma ji ku wisa ye? Xwedê xezib bi ser kurdan û Kurdistanê de barandiye.

Çiqas saziyên li dijî demokrasîyê hebin, ji bo kurdan ava bûne. Çiqas girtiyên ramanê hebin, ya kurd in yan jî doza çareserkirina kêşaya kurd dikin, an jî, di bernameya xwe de nasnameya kurdan nas kirine. Di hilbijartinan de tenê hilbêjêrên kurd tîne tehdîtkirin ku dengên xwe nedin HADEP'ê. Îşkence û girtîgeh jî bo kurdan in.

Li Tirkiyeyê demokrasî, li Kurdistanê faşîzmî ser kar. Belê yek caran Tirkiye jî bi ber bayê faşîzmê dikeve. Ango ew jî bi agirê me dişewtin.

Poşmaniya pašîn

Li gundekî Kurdistanê yekî xizan bi navê Îsa hebû. Rojekê du mêvanê wî tên. Îsa radibe du mirîşkên xwe ji wan re serjê dike, dipijîne û êvarê tîne datîne-ser sifrê. Gava ku Îsa û mêvan li ser şîvê rûdinin, birayê Îsa Heso yê ku hê zaroke jî, li menzelê rûniştiye. Îsa ji birayê xwe re dibêje:

- Kek Heso, tu jî were bi me re şîvê bixwe.

Heso dibêje:

- Na bira, hûn bixwin. Pişt re ezê bixwim.

Heso çifikire û dibêje, jixwe wê nikaribin goşt xelas bikin, wê ji ber wan goşt bimîne, pişt re jî ezê têr bixwim. Îsa çend caran gazî Heso dike, lê dîsa Heso naçe bi wan re xwarinê naxwe.

Qasek dibore, Heso lê dinêre ku mêvan wê goşt xelas bikin, jê re tiştêk namîne. Lê îcar jî şerm dike ku ji ber xwe ve here li ser şîvê rûne. Di dilê xwe de dixwaze ku birayê wî careke din wî dawetê xwarinê bike, lê êdî deng ji birayê wî dernakeve. Heso ji birayê xwe re dibêje:

-Bira gava din te ji min re çi digot? Ka careke din jî bibêje.

Îsa:

-Bira, weleh min tiştêk negotiye, tiştêk nayê bira min.

Heso:

-Belê, belê, te berî qasekê tiştêk ji min re got.

Îsa dîsa jî dibêje:

-Min tiştêk negotiye.

Jixwe heya ev gotin di navbera wan de derbas dibin, goşt jî xelas dibe. Heso pir poşman dibe lê êdî tiştêk ji destê wî nayê.

FAYSAL ÖZDEMİR

Mirovê Nêçîrvan û mele

Li Başûrê Biçûk, mirovekî karker hebû. Her dem kar dikir û wextê kar tunebûya jî tajiye xwe dida dû xwe û diçû nêçîrê.

Bi çûna nêçîrê re, hin caran tişt digirtin, carinan jî destvala dihat malê. Rojekê zarokên mêrik, diçin nêçîrê û di wê rojê de roviyekê digirin û bi kêf vedigerin malê. Radibin roviyê xwe serjê dikin. Bavê zarokan ji zarokên xwe re dibêje:

- Ka bisekinin ezê herim ji meleyê gund bipirsim; gelo goştê rovî helal e an heram e?

Mêrik, ji mal derdikeve, berê xwe dide cem mala mele; ji mele re dibêje:

-Melayê heja zarokên min roviyek girtine, goştê wî helal e an heram e?

Mele lê vedigerîne û dibêje:

- Welahî bilehî goştên roviyan pir heram e û nayê xwarin.

Gava mele wisa dibêje, mêrik jî lê vedigerîne.

- Wey Xwedê wan zarokan nehêle.

Mele:

- Çima tu li wan zarokên reben nifiran dikî?

Mêrik, dibêje:

- Welehî bilehî zarokan tepsiyek rehnîkên rovî birin ji mala we re. Ji bo ku zarokên te bixwin.

Gava ku mêrik wisa dibêje, mele di bin simbêlan de dikene û lê vedigerîne;

- Ma roviye an ûrê rovî ye?

Mêrik, ji mele re dibêje: Perçeyek ji ranê rovî ye seydayê min.

Dema nêçîrvan wiha dibêje mele:

- Way mala te mîrat nebe, te çima berê niha nedigot, ma ji goştê wî xweştir û helaltir çi heye?

BERHEVKAR: RIYAD AHMET

Hemşîreya horî

Yekî Sofî, xistibû hişê xwe ku li exretê heftê horiyî bi dest xwe bixe. Si-behê heta êvarê nimêj dikir û sil diwanzdeh meh bi rojî bû.

Rojekê ji birçîna bêhiş dikeve û malbatiyên wî dibin nexweşxaneyê. Demekê derman didinê hinekî bi serxwe tê. Çavên xwe vedike dinêhere ku di nava nivînên spî de ye û hemşîreyek bi cilên spî di ser re sekiniye. Sofî ji xwe re difikire dibêje: "Weleh qey ez mirime û vêya jî horî ye."

-Ka?... Ka yên din, ma tu tenê ji min re şandine?

Ya hemşîre dibêje:

- Erê wele ez tenê me, ma ne bes e?

Sofî:

-Na, na weleh, mafê min heftê hebin, ez heftê hebî dixwazim. Divê heftê horî werin ya na ez napejirînim.

Rojekê leşker diavêjin ser gundekî, gundeyekî digirin û jê pirsra gerîla dikin. Leşkerek dibêje: Buralarda terorist górdûn mü lan!

Gundî dibêje: Na!

Leşker bawer nake û îcar bi hêrs dibêje:

-Sana söyliüyorum, doğru söyle, teröristler buraya geldi mi, gelmedi mi?

Gundî li ser vê yekê bi tirkî ya xwe ya niv-co bersivê dide:

-Qomitan anan avradım olsinkî buraya teröri gelmedi.

ÇIYA MAZÎ

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (92) XAÇEPIRSA

H	E	G	A	S	E	D	
C	E	G	E	R	X	W	I
B	O	R	I	E	I	R	A
B	A	L	I	E	O	A	S
N	A	L	I	E	N	T	A
Q	N	A	V	I	N	I	N
P	T	A	M	O	R		
D	Ü	E	R	A	S	E	
T	O	N	R	I	S		
Z	E	R	E	N	S	I	

Bersiva Xaçepirsa 90'î

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 92'yan pirtûka Seracettin Kırıcı (Nalîna şevê) ye



Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmarê 90'î pirtûka Seracettin Kırıcı, "Eşa Haderê jana Amedê" qezenc kirine: **Pîroz Yıldırım/Amed, Jiyan Ronîzer/Êlih, Rohat Baran/Qeyserî, Sadun Temel/Manisa, Metin Kaya/Stenbol**

Mehtap Rewşenbîrê kî kurd (Wêne)	Naveki mêran Mîlyet	Dara tîrî Bi hev re	Şidet Jêderk	Êdî Berepaşkî Dr.	Oksijen
2				3	
Ezîmandî Roj					Paşgîrek
			Neodîm ... Amedê	Sodyûm Qertafa neyîniyê	
Berepaşkî hejmarek Silqê xaşandî		Bi kirdkî xwe	Rojek Seydayê...	Azot Tîpeke dengdar	
		Bîn... Bûm	4	Bi soranî ev Têbînî	
Lêgerin Fosfor					
1	Hiç, qet Dijberê nêr		Aryanî Agîr	5	
Fena, noli, wekî Hejmarek			Jan Tîpa yekemîn		
		Pivana, derman			



Kişttoxê tever de, roşnîkarê zere de

Oyo winî ayseno ke, ciwabê nînano nezdi jî nêdiyo. Çimke êkê nameyê ci, nê çetî û çetanê bînan miyan de ravêrdê, çend hebê înan çekardî zîndan, mabend ra jû ser nêravêrd, ê pêro viraday û iyê ewro ma miyan de dest û milê xo şanenê, geyrenê.

Par nê rojan de, hema hema hemû kesî, vardiyayinê mercedes û kamyon ser qisey kerdê û her kesî vatê: "Bucak, Kocadağ û Çatlı senî amey pê het, karê nînan pê het çiç yo?" Pêrikan jî raşt vatê, jew mebûs û serokcaş, jew persbenoyê polîsan û jew jî kişttox (katil) senî yenê pê hetek?

Neziyê (qeza) Susurluk sera, jû ser ravêrd û ciwabê nê persan nêdiya (niyame dayîn). Oyo winî ayseno ke, ciwabê nînano nezdi jî nêdiyo. Çimke êkê nameyê ci, nê çetî û çetanê bînan miyan de ravêrdê, çend hebê înan çekardî zîndan, mabend ra jû ser nêravêrd, ê pêro viraday û iyê ewro ma miyan de dest û milê xo şanenê, geyrenê.


Zek yeno zanayin, o wext nameyê hemû serdarane dewlet, nê çetî miyan de ravêrdê. Taybetî jî wezirê karê zeriye, ê wextî Mehmet Ağarî. Wexto ke no çete vejîya werte, o çax Mehmet Ağarî hema îstîfa kerd, la belê îstîfay jî nêşa riye dewleto liminî (qilêrinî) raceno.

Ancî, o wext Mesut Yılmaz serokwezîr nêbi û vînan de şiyê nê çetî ser û vatê ezo peyniya nê çetî biyarî. Ek ez bêrî hokmat, ezo vîst rojan miyan de persboneyê nê çetiyê ke, dewlet miyan de nê, înan pêrikan vejî werte. (Zek yeno zanayin û vîrî M. Yılmazî xo jî Budapeşte de nê çetî ra sila wardîbî ci û zinciya ci şikyêbî.)

Ewro hema hema 4 mengî (aşmî) yo, M. Yılmaz biyo serokwezîr, vatan ke cad bo, qe teva jî nêkerdo, viradê teva kerdin, endamê nê çetan serokwezîrîna M. Yılmazî de viradiyay. Yanê oyo ke vatê: "Ezo vîst rojan miyan de, nê çetî vejî werte", ewro rojan miyan de, nê çetî vejî werte. "Werte vetenê nê çetî mi mepawê, ez tenya nêşana teva bikrî, ge-

rek şar jî mi rê hetkarî bikro."

Rastî M. Yılmazo rast vano, o nêşeno nê çetî vejo werte, (xora oyo xo jî nêwazeno) ey o wext nê vatenî qandê serokwezîrbiyî vatê, xora winî nêbiyayê endamê nê çetan, tevera nêbiyê, serokê nê çetî Mehmet Ağar û serokcaş Sedat Bucak jî nika parlamento de nêbiyê. Nê pêro winayê biyarê xo vîrî, 1990 de Demirelî qanûnê bingehî (anayasa) girotê xo dest û şiyê kofî rexne kerdê û vatê: "Na demokratîk niya, ek şima mi serokwezîr kirê, ezo nay bivurnî." La belê o jî senî ke, bi serokwezîr, nê vatênê xo, xo vîra kerdî û qanûnê ke, o roj rexne kerdê, oyo înan qe xo tûnik ra nêvejenê û şino kotî, înan mûseno û vano: "Tirkiye dewleta demokrasi û ê huquqî ya, heme çî gorey qanûnê bingehî virazyeno." Nê vatenanê Demirelî ser jî mayê vam, ek Tirkiye dewleta demokrasi û ê huquqî biyayê, kişttox İbrahim Şahin, embazê ci, çeteyê Yüksekovay, kişttoxê tepşiyayanê zindanê Amedî, ê Metin Göktepey,



Memet Ağar û Sedat Bucak tevera nêbiyê, Eşber Yağmurdereli, Hatip Dicle û embazê ci, İsmail Beşikçi û êkê zey nînan ê jî zîndan de nêbiyê, nûwa tepya kes nêşeno şarê ma bixapeyno. Çimke şarê mawo nîna ewro rind silaseno.

MEMED DREWŞ

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Lî ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN YÖYLER
Gerîndeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê Têkiliyên
bi Gel re
(Halkla İlişkiler
Müdürü)
METİN AKSOY

Berpîrsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NAVNIŞAN
Ayhan Işık Sk.
No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:
(Nünerê Giştî yê
Ewrûpayê)
Mahmut Gergerli
49 871 67 08 84

Brüksel:
Medenî Ferho
32 532 721 12 03

Suriye:
Jana Seyda
Helim Yûsiv
Berlin:
Silêman Sîdo
00 49 30 691 6495.

Hannover:
Selim Biçûk
49 572 18 13 60

Stockholm:
Robin Rewşen
46 87 51 05 64

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Hollanda:
S. A. Fewzî
31 104 85 55 43

Lêkolîner Mustafa Borak:

Her kesê xwende ne ronakbîr e

Ji bo ronakbîriyê jî pirtûk nivîsandin, an berhem afirandin an jî li zanîngehan xwendin ne pîvanek e. Dibe ku gundiyeke zana, rêber, fedakar wekî ronakbîreke herî mezin bê pejirandin.

Demek berê Komcivîna Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Ewrûpayê pêk hat. Ji bo komcivîne ji Türkiye û Kurdistanê gelek nivîskarên kurd vexwendiyê komcivîne bûn. Yek ji wan jî Birêz Mustafa Borak bû. Li ser vê dawetê, nivîskariya wî û gelek tiştên din hevalê me **Ferec Çobanoğlu** bi mamosta Mustafa Borak re axivî.

Damezirandina PEN'a Kurd di warê tekoşînê de ji kîjan rewşan biziriyê?

■ Bêguman, tekoşîna neteweyî bingeha hemû saziyên kurdan ên îroyîn e. Tevera Azadiyê çawa ku gelê kurd ji mirinê zivirand û vejînek pîroz bi ser xist, wisa jî bû sedema zîldayîna saziyên neteweyî yên cur bi cur. Îro di dîroka kurdan de cara yekemîn e ku ev qas sazî hatine avakirin. Ev pir balkêş e. Em dikarin bibêjin ku pirsgrêka gelê kurd a herî girîng pêşvebirin û kemilandina van saziyan e. Ji ber ku ev sazî û dezgeh bingeha jiyan û serkeftina gelê kurd in. Ji bo ku civakê an jî neteweyek bigihêje û bikemilê, hewce ye saziyên wê bigihînin û bikemilînin. Bi kurtasî divê mirov bibêje ku; pêvajoya îroyîn di her warî de bi sazî û bi rêxistin e. Heya di her alî de sazî û dezgehên neteweyî neyên damezirandin, vejîna kurd a nû tu car bi ser nakeve. Kul û tajana (qolînca) ku em îro dikişînin ji çekên dijminan zêdetir, ji ber kêmasiyên me yên di vî warî de ne.

Vêca ev xebata PEN'a Kurd jî divê bi vî awayî bê nixandî. Damezrandina PEN'a Kurd jî, ji van saziyan yek e. Ew jî organeke laşê vê dozê ye. Ma şer bi çekan tenê dibe? Pênûs, ziman, mêjî û hwd. jî ne çekên tekoşînê ne?

Li ser komcivîna û PEN'a Kurd pêşniyaz û daxwaz

Kurtejiyana Mustafa Borak

Di sala 1956'an de li navçeya Tuzlucaya Îdirê hatiye dinyayê. Perwerdehiya xwe ya seretayî û amadeyî li Tuzlucayê bîriye serf. Li Perşembeyê (navçeya Ordîyê) jî dibistana mamostefiyê gedandîye û bûye mamoste.

Li gelek deverên welat mamostefî kiriyê û di vî navê de jî, ji layê dewletê ve gelek caran celi deverên din bûye û mamostefî jî ji dest wî hatiye girtin. Di sala 1981'ê de ji ber sedemên ramiyarî li Girtîgeha Erzeromê razaye. Mamosta Borak demeke dirêj li Navenda Çanda Mezopotamya şaxa İzmirê xebatên xwe domandin û dersên ziman dan.

Di nava weşanên Berfin de bi navê "Gotinên Pêşiyên Kurdan" pirtûkeke wî derket. Niha jî li ser biwêjanê kurdî xebatê dike, xebata wî ya li ser vî warî li ber qedîne ye.

zên wê çi ne?

■ Gelek pirsgrêkên tînin. Çawa ku tê zanîn ev pirsgrêk zêdetir li ser kesayetiye ne. Di serî de ez bi xwe jî di nav de, hê giyan û bêhna tiştên nebaş me li ser xwe neavêtiye.

Divê rêxistina PEN'a Kurd ne tenê li ser kaxezan, lê bi karwanî jî ronakbîr û nivîskarên kurd re bibe rêber, bibe tîrêjek germ û spehî. Divê ew jî hemû nivîskaran re bibe sîwanek. Di hemî beşên edebiyatê de rêberiyê tîkûz û alîkariyê zanîstî û akademîk divê bê meşandin. Berî her tiştî cih girtina nivîskarên kurd a di nav PEN'a Cihanê de bi rastî jî girîng e.

Li ser ronakbîriya kurdan nêrinên we çi ne? Ronakbîr û entelektuel kî ne?

Bi dîtina min ronakbîr û entelektuel wateya wan ne yek e. Dibe ku gelek caran ronakbîr entelektuel bin, lê her entelektuel ne ronakbîr e. Entelektuel di gelek waran de zana ne, lê wê zanebûna xwe bi rêxistinî jî bo gel naxebitînin û tu berpirsiyariyê hilnagirin ser xwe. Ji "entelektuel" ez vî fêhm dikim.

Ronakbîrî jî jixwe-navê wê li ser e: Ronî dike, şemal dide, rewşa jiyan û cihanê nîşan dike, rîya rast rê dide. Tîrêjê dide ser tariyê. Ji belangaz û rebanan re rêveberiyê dike.

Bêguman em jî bo ronakbîran dikarin İsmail Beşikçi mînaknîşan bidin, ji ber ku ew tiştê ku pê bawer e, hem dibêje û dinivîse û hem jî ji bo wê baweriyê xwe bi cesaret jî me kurdan bêhtir, bedelan dide.

Taybetiyek ronakbîriyê jî ew e ku, Kî dibe û kîjan rêxistin dibe bila bibe, divê ronakbîr dîtîna û ramanên xwe bêşik û bandor bîne zimên. Hewce ye mirovê ronakbîr rewşa civakê, psikolojiya mirovan, edet û rewîştên gel, pêvajoya welat û dinyayê bibîne û bîne holê.

Ji bo ronakbîriyê jî pirtûk nivîsandin, an berhem afirandin an jî li zanîngehan xwendin ne pîvanek e. Dibe ku gundiyeke zana, rêber, fedakar wekî ronakbîreke herî mezin bê pejirandin. Em dikarin bibêjin ku di vejîna û berxwedana kurdan de rîsta van ronakbîrên bênav ne hindik e.

Li ser kêmasî û rexneyên der heqê pirtûka we "Gotinên Pêşiyên" de bersivên we çi ne?

■ Bêguman wê rexne jî, pesin jî hebin. Hingî pirtûk çap bûye, her du jî hatin. Jixwe di pêşgotina pirtûkê de li ser kêmasiyên di warê azîneyê de gelek agahî hatine nivîsandin.

Divê mirov dîsa jî bibêje ku, xebateke wekî gotinên pêşiyên bi rastî jî girîng e. Ez bawer im ku di pêşerojê de li ser xebatên wisa girîng, bi zanyarî û bi sazgehî wê bê rawestînin. Jixwe ne ew tenê, divê li ser alfabe, gramer û gelek mijaran din jî xebat bînin kirin.

Berî her tiştî li ser kurdî û tirkî nivîsandin û wergera tirkî rexne çêbûn. Di tirkî û kurdî nivîsandinê de armanc ev bû ku pirtûk pirtir bê xwendin û baştir bê fêhmîkirin. Bi rastî jî gelek di vî mijarê de dîkweşîya xwe anîna zimên, lê ez jî dixwazim kurdî bi serê



xwe di her warî de sax vede. Xebata duyemîn ya li ser "Biwêjanê Kurdan" wê bi xwerû kurdî be. Taybetiyên "biwêjan" jî wisa divê.

Wekî ku ez dizanim ev pirtûk û "Gotinên Pêşiyên Kurda" cara yekemîn e ku biwêj û gotinên pêşiyên ji hev hatine derxistin. Ji bilî wê di vî pirtûkê de gotinên pêşiyên ji gelek alîyan ve hatine zelalkirin. Yên biyanî û dubaretiyê hatine porizandin.

Li ser wergerê hin rexne hatin kirin. Rast e, wergerê bi rastî jî gelek astengî derxistin holê, lê jixwe di gotinên pêşiyên de zêdetir jî di biwêjan de wergerê karekî pir dijwar e. Cudatiyên ziman û çanda gelan ne guncan e ku mirov bi hêsanî jî holê rake. Ji ber wê, dibe ku hin kêmasî û çewtî çêbûbin. Jixwe me tu car negot ku xebata me bêqisûr e.

Ji bo biwêjan jî em dikarin bibêjin; bi gelemperî herêmi ne. Gelek caran qafiyê tînin bikaranîn. Zêdetir wateyên wan mecazî ne. Ji wan gelek kurteçirokên afirandina wan hene. Her herêmekê biwêjan wê cihê ne.

Hûn çend salan li ser vî mijarê xebitînin?

■ Tevî biwêjan jî çar salan zêdetir. Li gelek deveran min berhev kirin. Ya balkêş ev bû ku, pirtûkên di vî warî de di dawî yê de ketin destê min. Lê bi kêrî min hatin.

Gotineke we ku di dawiyê de hûn bêjin heye?

■ Divê di her çar parçeyên welat de zanyar bi hev re xebatê bikin. Ez bawer im ku kêra me pir di vî yekê de heye.